



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Lîsansa Bilind Ya Bêtez

**DÛBLAJÊN KURDI JI BO ZAROKAN:  
AVATAR Û ŞÎNOK**

Muaz ÇETİN

18721004

Şewirmend

Dr. Yılmaz ÖZDİL

Mêrdîn-2020



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Lîsansa Bilind Ya Bêtez

**DÛBLAJÊN KURDI JI BO ZAROKAN:  
AVATAR Û ŞÎNOK**

Muaz ÇETİN

18721004

Şewirmend

Dr. Yılmaz ÖZDİL

Mêrdîn-2020

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum

“.....” adlı tezin/projenin

tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

31/01/2020

Muaz ÇETİN

## KABUL VE ONAY

**Muaz ÇETİN** tarafından hazırlanan Tezin/Projenin Adı adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından ..... Anabilim Dalı, ..... Bilim Dalında (varsa) **YÜKSEK LİSANS TEZİ/DOKTORA TEZİ/PROJESİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]

---

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

---

---

---

## PÊŞGOTIN

Projeya me di pêşvebirina qabîliyeta zimanê zarokan de bala xwe daye qadek cuda. Ev jî alavên audî-visûel in. Metaryalên video, di TV de kanalên tematîk yên zarokan, keresteyên înternetê hin ji van nin. Bitaybetî filmên kartonî(cartoon, çizfi film) yên bîyanî gelek bala zaroka dikîşînin û di bernemeyan kanalên tematîk wek Zarok TV de rejeyek bilind cih digirin. Wexta ji bo wan berhemana dûblaj tê kirin divê şewaza me çibe? Projeya me bersiva vî pirsê lêdikole.

Di amedekariya vî projeyî de keda şewirmendê min Yılmaz Özdil gelek zêde ye. Yılmaz Özdil mamosteyek gelek hêja û serkeftîye. Standardê wî gelek bilindin. Mamoste gelek cara bi nêrînên xwe yê hêja piştgirîya min kir. Ez gelek spas dikim ji bo alîkarîya wî. Herwiha ez spasîyên xwe li mamoste Kenan Subaşi û Şehmus Kurt dikim ji bo peşnîyarên wan. Di dawîyê de hevjin û kurê xwe re spas dikim ji bo sebir û piştgirîya wan.

Muaz ÇETİN

MÊRDÎN-2020

# DÛBLAJÊN KURDI JI BO ZAROKAN: AVATAR Û

## ŞÎNOK

### KURTE

Li gor piranîya lêkolînên ku li ser ziman hatine kirin di Tirkîyê de rêjeya axaftina bi kurdî metirsîyêkê de ye. Ji bo bergirîya vê rewşê perwerdeya zarokan ya bi zimanê Kurdî cihêkî giring digire. Bi nêrînên pedagojîk ve perwerdeya zarokan bi meteryalên hînkarî (teaching materials) ve hêsantir dibin. Gelek lêkolînên li ser meteryalên hînkirinê di warê kurdî de bingehîn meteryalên nivîskî be jî hemû dinayayê zarokên vê çaxê weqtên xwe pêtir ber TV û alavên ragihandinê yê audiovîsuel derbas dikin. Ji bo vê yekê di pêşvebirina qabiliyêta zimanê zarokan de li ser rola televîzyonên tematîk yê zarokan wek Zarok TV, Cartoon Network, Disney Channel de lêkolîn berfirehtir dibin. Fîlmên kartonî (cartoon, çizgi film) yê dûblajkirî di bernameyên van kanalên tematîk de beşek mezin digirin. Li gor vê rewşa zimanê Kurdî weqta dûblaj ji bo zarokan were kirin divê stratejî ya me çî be? Xebata me bersiva vê pirsê digere û ji du pêngavan pêk tê. Pêngava yêkem de em ê şewaza wergera metnên dublajê, teknikên werger û di dûblajê de hevsengîyê li gor vê rewşa zimanê Kurdî bi rêbaz û teorîya werger ya Skopos binirxînin. Pêngava duyem de jî beşek versiyona orijinal û dûblajkirî yê *Avatar* û *Şînokê* (The Smurfs) ku me ji Zarok Tv standîye li gor encama pêngava yêkemîn berawird û tehlîl bikin.

**Bêjeyên Sereke:** Zimanê Kurdî, fîlmên kartonî, dûblaj, Avatar, Şînok

# ÇOCUKLAR İÇİN KÜRTÇE DUBLAJ: AVATAR VE ŞİRİNLER

## ÖZET

Dil üzerine yapılan bir çok araştırmaya göre kürtçe konuşma oranı korkulacak düzeylerde bulunmaktadır. Bu durumun daha da kötüleşmesini engellemek için çocukların anadil de eğitimi önemli bir yer tutuyor. Bir çok pedagojik görüşe göre çocuk eğitimi öğretim meteryalleri ile kolaylaşıyor. Öğretim meteryalleri üzerine yapılan araştırmaların merkezinde yazılı meteryaller olsada tüm dünyada çağımız çocukları vakitlerinin çoğunu TV ve diğer audivisuel araçlar karşısında geçiriyor. Bundan dolayı çocukların dil kabiliyetlerinin gelişmesinde Zarok TV, Cartoon Network, Disney Channel gibi tematik çocuk kanallarının rolü artmaktadır. Dublaj yapılmış çizgi filmler bu kanalların yayınlarında büyük bir orana sahiptir. Kürtçenin bulunduğu durumu göz önüne alırsak çizgi filmlerin kürtçe dublajı nasıl yapılmalıdır? Çalışmamız bu sorunun cevabını arıyor olup iki aşamadan meydana gelmektedir. Birinci aşamada dublaj yapılan metinlerin çeviri şekli, teknikleri ve dublaj da eşleşme kürtçenin bulunduğu durum göz önüne alınarak Skopos kuramına göre değerlendirilecektir. İkinci aşamada ise Zarok Tv den alınan Avatar ve Şirinlerin orijinal ve çevirisi yapılmış dublaj metinleri karşılaştırılıp tahlil edilecektir.

**Anahtar Sözcükler:** Kürtçe dili, çizgi film, dublaj, Avatar, Şirinler

# **DUBBING FOR CHILDREN: AVATAR AND THE SMURFS**

## **ABSTRACT**

According to a lot of reseach, rate of kurdish speaking population has a dangerous situtation in Tukey. For preventing this station children education of kurdish language is very important. There are a lot of pedagogic research shows us teaching meterials makes language education more easier. Even if most research about writing teaching meterials but children of all over wrold spending more time on TV and audiovisuel meterial. Because of that children channel as Zarok TV, Cartoon Network, Disney Channel playing more important role for improving ability of kurdish langugage. Dubbing cartoons being big part of children channel programs. According to situtation of Kurdish language when we make dubbing for children which path should be selected? Our project looking for this answer and is made two part. Fisrt part of this project about translating of dubbing script, technic of trasnlating and synchronisation of dubbing in process theory of Skopos. Second part of this project about analyze and compare one episode Kurdish dubbing scripture of The Smurfs and Avatar.

**Key Words:** Kurdish Language, cartoon, dubbing, Avatar, The Smurfs



# NAVEROK

<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>I</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>II</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>III</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>IV</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>V</b>
<b>LÎSTEYA TABLOYAN</b> .....	<b>VII</b>
<b>LÎSTEYA ŞIKILAN</b> .....	<b>VIII</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>BEŞA YEKEM:</b> .....	<b>5</b>
<b>BI ZIMANÊ KURDÎ DÛBLAJ JI BO ZAROKAN</b> .....	<b>5</b>
1.1. REWŞA ZIMANÊ KURDÎ LI TÏRKÏYÊ .....	5
1.2. BIKARANÎNA TV WEKÎ AMURÊ FÊRKIRINA ZIMANÊ.....	10
1.2.1. Zarok TV û Şewaza Weşanê.....	13
1.3. DÎ FÎLMÊN KARTONÎ YÊN DÛBLAJKÎRÎ DE ŞEWAZA WERGERA METNÊ, TEKNÎKÊN WEGER Ê HEVSENGÎYA DÛBLAJÊ .....	17
1.3.1. Faktorên Li Nav Nivîsê De.....	18
1.3.2. Faktorên Li Derveyê Nivîsê De.....	22
1.3.3. Teknîkên Wergerên Audîvîsuel .....	22
1.3.4. Hevsengîya Dûblajê.....	24
1.4. DERHEQA AVATAR Ê ŞÎNOKÊ.....	26
<b>BEŞA DUYEM:</b> .....	<b>28</b>
<b>TEHLÎLA DÛBLAJA KURDÎ YA AVATAR Ê ŞÎNOKÊ</b> .....	<b>28</b>
2.1. DESTNÎŞANKÎRINA TEKNÎKÊN WERGER DÎ AVATAR Ê ŞÎNOKÊ DE .....	28
2.3. DÛBLAJA AVATARÊ Ê DÛBLAJA ŞÎNOKÊ: METNÊ ORJÎNAL Ê METNÊ KURDÎ.....	32
2.2. DÎ AVATAR Ê ŞÎNOKÊ DE ÇAWANÎYA HEVSENGÎYÊ.....	40

2.4. BERAWİRDKİRÎNA DÛBLAJA ŞÎNOKÊ Û AVATARÊ.....	43
<b>ENCAM.....</b>	<b>44</b>
<b>ÇAVKANI.....</b>	<b>45</b>
<b>PÊVEK .....</b>	<b>48</b>

## LÎSTEYA TABLOYAN

<b>Tablo 1.1.</b> Kona Hînbunê (1969) .....	12
<b>Tablo 1.2.</b> Dîrokên weşanê yê Avatar e.....	28
<b>Tablo 1.3.</b> Wergerên Avatarê.....	36
<b>Tablo 1.4.</b> Wergerên Şînokê.....	36
<b>Tablo 1.5.</b> Li Avatarê ehlîkirin.....	40
<b>Tablo 1.6.</b> Li Şînokê Ehlîkirin.....	41

## LÎSTEYA ŞIKILAN

Şikil 1.1. Erdnigarîya Kurd Lê Dijîn.....	8
Şikil 1.2. Weneyek ji programa Subtitle Workshop.....	35
Şikil 1.3. Weneyek Ji Avatar.....	43

## DESTPÊK

Di dinyayê de tehmînî li navbera 5000-7000 ziman tê bikaranîn. (Summary by world area, 2019). Li alfyê navnetewî ve 196 dewletên deshilatdar tê naskirin. Parek mêzin ji van zimanan ‘‘zimanê kêmanîye’’ (minority language) ne. Hin zimanê kêmanîyê heman demê zimanê fermîne wek zimanê îrlandî. (Minority Language, 2019). Zimanê kurdî li gor bihêzbûna xwe ve li dinyayê zimanê 89’em e (Chan, 2019).

Piştî herba yêkemîn ya dinyayê bi peymanana Sykes-Picot ve piranîyên Kurd li nav çar dewletên rojhilatî hatîye parvekirin. Kurd li nav van dewleta bê statû heta niha jîyan e. Di vê çarçovê yê de heza zimanê kurdî roj bi roj lawaz dibe û bûyê zimanê kêmanîyê. Zimanê kêmanî li gor ‘‘Peymana Ewropa ji bo Heremî an Zimanên kêmanî’’ (European Charter for Regional or Minority Languages) vî şeklî tê pênase kirin;

Ew zimanên di deverê ji dewletek de bi kevneşopî aliyê hemwelatîyên ve tê bikaranîn ku ew hemwelatî li gor hejmarîyê ve ji hemwelatîyên mayî kêmtirin; û ne li di nav zimanên fermî de ne.

Li gor vê pênase yê zimanê Kurdî ne tinê Tirkîyê herwiha Iraq, Îran, Sûreyê û Qewqasa jî zimanê kemanîyê ye. Zimanê kurdî li îraqê niha zimanê fermîyê lê di dîrokê de gelek cara ev rewş guherîye û ne stabîl e. Di sedsala dawî de hebûna zimanê kurdî ji bo polîtîkayên asîmîlasyona dewletên serdest û globalîzma dînyayê ketîye rewşek xeternek. Ji bo bergirîya vê rewşê perwerdeya zarokan ya bi zimanê Kurdî cihêkî giring digire. Çaxa zaroktiyê de yek jî tiştê herî balkêş fêrbûna zimane. Di çend sala de zarok ferhenga xwe ya kelmê mêzin dikin û hakimê tevlihevîya strûktûra zimanê xwe dibin (Aslan, 2019). Fêrkirina ziman herî hêsan di weqtê zaroktiyê de mimkîn e. Montessorî vê mijarê wisa neqil dike:

“Zarok bi awayê mezinan hînê ziman nabin. Mirovekî gihaştî dema bixwaze zimanekî dî hîn bibe, bi tevahî zanyarî û agahîyên xwe hewl dide û gelek zehmetiyan dikişîne. Lê di zarokan de jixwe ev zanyarî û agahî nînin ku arîkariya wan bigrin. Yanî mekenîzmaya wan a qezenckirina ziman bêhemdê xwe digere û rastî zehmetî û dijwariyan nayête...” (Subaşi, Ji Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan, 2014)

Materyalên hînkariyê di hînkirina zimanî bi zarokan jî xwedî cihekî girîng in. Pêvajoya perwerdeyê ji gelek hêmanan pêk tê;

Cihê perwerdeyê, mamoste, xwendekar, materyalên hînkariyê hwd. Pêvajoya perwerdeyê ya ku bikêrhatî û berhemdar derbas dibe, encama lihevkirina serkeftî ya hêmanên perwerdeyê ye. Ji van hêmanan, materyalên hînkariyê (ango materyalên dersê, materyalên alîkar) bandoreke mezin li ser qelîteya perwerdeyê dikin (Kurt, 2015).

Di warê kurdî de piraniya lêkolînên li ser materyalên hînkirinê bingehîn, materyalên nivîskî be jî hemû dinayayê, zarokên vê çaxê weqtên xwe bêhtir ber TV û alavên ragihandinê yê audîovîsuel derbas dikin. Bi çaxa dijîtal vir ve medayaya audîvîsuel heta bêje bes bela bûye û mûşterîyên van amuran zêde bûye ku çekirina van cureyan roj bi roj zêde dibe (Şahin, 2012). Di jiyana rojanê de mirov herî zêde rastî cureya audîvîsuel tên (Jenecova, 2012). Materyalên audîvîsuel bi kombînasyona deng û dîtbarî ve pêk tên û ji bo vê yekê bandora wî di hînkirina ziman de zedetir e. Di pêncî salên dawî de bi taybetî ji bo zarokan gelek kanalên tematîk vebûn. Hin ji van navtevî ne wek Disney Channel, Cartoon Network hin jî heremî ne wek Zarok TV. Ev kanal 24 seet weşana zindî dikin û zarok roj bir roj zêdetir girêdayî van kanalên dibin. Ji bo van teyîbetîyên hanê berhemên audîvîsuel di hînkirina ziman de roj bi roj zêdetir bala lêkolîneran dikişînin.

Li nav materyalên hînkirinê, materyalên werger<sup>1</sup> çî nivîskî çî audîvîsuel be ji bo xilaskirina zimanê kêmanîyê û di pêşvebirina qabîliyêta zimanê zarokan de cehekî merkezî digirin. Bi materyalên werger ve zarok xwe digîhîne asta çanda popûler ya dinyayê û ev materyal tune bin zarok tu carî xwe nikarê bigehîne berhemên herî balkêş

---

<sup>1</sup> Werger: translation, çeviri  
Wergêr: translator, çevirmen

yên welatên din (O'connel, 2000). Ev cureyên materyalan li ber zimanê serdest alternatîfan ava dikin ku rêjeya bandora zimanê serdest daxin. Bêguman ji bo zimanek zindî û bicazîbe divê berdewamî weger were kirin.

Fîlmên kartonî yên dublajkirî yêk ji van materyalên werger e. Bi taybet ew kanalên tematik yên zarokan ku di zimanê kêmanîyê de weşanê dikin di bernemayê wan de fîlmên kartonî yê dûblajkirî beşek mêzin digirin. Çimkî çekirina fîlmên kartonî ya bi hêja mesrefek mîlyon dolarî, karkerên zanyar, alavên teknîkî dixwazin. Ji bo vê yekê dûblajkirina van berheman li gor çekirinê gelek erzan e. Kanalên tematîk ya zarokan yên di zimanê serdest(bihêz) weşanê dikin gelemperî armanca wan tîcari ye (Efe, 2014). Ji bo vê bername zedetir li ser keyfxweşîya zaroka ne. Perwerdehîya zarokan di van kanalan de ne armancê sereke ne. Li gor vê rewşa zimanê Kurdî ku bûye zimanê kêmanîyê weqta dûblajên fîlmê kartonî were amede kirin divê stratejî ya me çi be? Xebata me bersiva vê pirsê digere û ji du pêngavan pêk tê. Pêngava yêkem em ê teknîkên wergera metna dûblajê û di dûblajê de hevsengîyê li gor vê rewşa zimanê Kurdî bi rêbaz û teorîya werger ya Skopos binirxînin. Pêngava duyem de jî beşek versiyona orijinal û dûblajkirî yên Avatar û Şînokê (The Smurfs) li gor encama pêngava yêkemîn berawird û tehlîl bikin.

Çi şixul ji bo zarokan bin mîna perwerde, çîrok, stran divê bi nêrînek pedagojîk were amede kirin. Di dûblajê de merhelaya yêkem wergera metna fîlmê kartonî ye. Dûblaj peşî her tiştî şixulek weger e û beşek ji wergera audîvîsuel e. Bi dûblajkirina fîlmên kartonî li ser metnê werger tê kirin. Weqta wergerê metnên fîlmê kartonî were kirin; derxistin(omission), foknsiyona hevsengî (fuctional equvalence), herî nîzîk hemwate(the closest synonym), ronîkirin(description), wergera herfî (literal translation), neologîzatîyon(neologization), dewlemendkirin(enrichment) ev rêbaz tèn bikaranîn (Kubkowski, 2013).

Tayîbetîyên werge(retercûman) divê çi be? Hemû wergêr nikarin bi van metnên fîlmê kartonî wergerînin. Çimkî ev metîn ji bo zarokan e û pêwîstîya tecrûbeyê heye. Li gor lêkolînera fînî Riitta Oittinen divê wergêr, zaroka ku dilê wî de ye keşf bike, zarok

çawa difikirin, zarok çawa fehm dikin bizanin (Köprülü, 2015). Herwiha ev metîn li alîyê zimanzanek jî dive were sererast kirin. Di dûblajê de aliyê teknîkê ve karê me herî asteng dike hevsengî ye (Sayman, 2011). Di wegerên edebî de yekcar metin heye. Lê di wegera aûdîvîsûel de digel metn dîmen jî heye. Wexta em wergera aûdîvîsuel dikin divê em bala xwe bidin dîmena. Ango li navbera wergera metin û dîmêna divê hevsengî hebin. Istwan Fodor cara yekem qala hevsengîyê kirîye. Fodor hevsengî sê beja de disinîfîne.



## BEŞA YEKEM:

### BI ZIMANÊ KURDÎ DÛBLAJ JI BO ZAROKAN

#### 1.1.REWŞA ZIMANÊ KURDÎ LI TÏRKÎYÊ

Li cîhanê zêdeyî 6000 ziman tîn axaftin lê 2000 ji van zimanan bi kemtirîn hezar axiverê wan hene. Herwiha hejmara axiverê 15 ji wan digihin nîvê gelê dinyayê (Chan, 2019). Pevajoyên împaratorî, pîşesazî, û globalîzmê ji bo ziman û çandên heremî bûn feleketê mêzin. Wekî mînak ligel ku lî Devletên Yekîtiya Amerîkayê û Kanadayê 184 zimanên heremî hene, tene ji wan 20 heb li malê hînî zarokan tîn kirin li gorî lêkolînên dawî yê UNESCOyê îro li dora 5-6 hezar ziman hebûnê xwe didomînin û li gora xebatên ewledar bi hazaran jî wan zimanan dê sedsala 21ê de bi mirinê re rû bi rû bimînin (Çiçek, 2013). Di kîtebê “Ziman û Netewesazî” de giringiya ziman wisa tê terîf kirin.

*Ziman sembola sereke ya nasnemaya çandî ye û di pênaskirina nasnemaya neteweyî de ew girîngîyeke sîyasî hildigire ser milên xwe û dibe cudareke “rasteqîn”. Ziman, ji dem û mekanê azad, hêmaneke bingehîn a pêvajoya netewesaziyê ye; û wisa tê bawerkirin ku ew di navbera siberoj û pêşeroja neteweyekê de pîrekê ava dike. (Onen, 2018)*

Ji bo dîyarkirina rewşên zimanan li dinyayê gelek lêkolîn tîn kirin. Lêkolîna Kai L. Chan bi balkêşî rewşa zimanên cîhanê dide nîşa me. Ev lêkolîn li navbera 124 ziman hatiye kirin û zimana li gora hezên wan rêz dike. Îndeksa heza ziman bandora ziman li sehneya cîhanê bi riyek sîstemîk bandora ziman dinirxîne û bi 20 nîşanker ve 5 esase tayîbetîya ziman dipîvîne; erdnigarî, aborî, komunîkasyon, zanyarî û çapemenî,

dîplomasî. Zimanê Kurdî reza 89 û ji 1000 puana de 9 puan dest xistîye.<sup>2</sup> Li gor ve lekolînê 25 mîlyon axiverê Kurdî heye. Erdnigarîyê de rêza 92, aborîyê de rêza 69, komunîkasyonê de rêza 74, zanyarî û çapemenî de rêza 70 û dîplomasî yê de rêza 10 girtîye. Me wek tablo di pêvekê de destnîşan kirîye.ç

Kurd di aliyê erdnigarîyê ve di axek 550.000 km<sup>2</sup> de dijîn ku ji firehî ve Elmanyayê mêzintir e (Öpengin E. , 2011). Piştî herba duyemîn ya dinyayê ev ax ji Tirkîye, Îran, Surî, Iraq ve hatiye parvekirin. Zimanê Kurdî li Tirkîye, Iran û Surî ne xwedîyê statûyek polîtîk û zimanek fermî ye. Ji bo vê yekê tu piştgirî ji dewletê nastîne. Bê statûbûn nahele bi aliyê fermî ziman li welat were bikaranîn. Ev jî danasîna Kurdî li cîhanê kêmtir dike. Karên fermî ku ji bo ziman tê kirin çî nav çî dervê welat nikare beşdar be. Ji bo vê yekê Kurdî di lekolîna Kai L. Chan de ne rêzekî baş de ye.



Şekil 1.1. Erdnigarîya Kurd lê dijîn (Areas-settlement-Kurdish-Southwest-Asia, 2019).

<sup>2</sup> Tu carî lekolînên li ser Kurdan ne hesanin û bi taybetî welatên wek Tirkîye, Surî, Iraq û Îran naxwazin ev lêkolîn werin kirin. Çimkî piştî herba yekemîn a dinyayê bi peymanê Sykes-picot ve piraniyên kurd li nav van çar dewletên rojhilatî hatîye parvekirin û polîtakayên van dewletan li ser asîmalasyon e.

Kurd alîyê hejmarî ve herî zêde lî Tirkîyê dijîn. Li gor hin pênaseya, Kurdî li Tirkîye zimanek kêmane ye. Zimanê kêmane li gor “Peymana Ewropa ji bo Heremî an Zimanên kêmane” (European Charter for Regional or Minority Languages) vî şeklî tê pênase kirin;

Ew zimanên di deverê ji dewletek de bi kevneşopî alîyê hemwelatîyên ve tê bikaranîn ku ew hemwelatî li gor hejmarîyê ve ji hemwelatîyên mayî kêmtirîn; û ne li di nav zimanên fermî de ne.

Herwiha li gor Helen O Murchu ku seroktîya bûroya ewropa yê zimanên kêmane kirîye, zimanên kêmanîye wisa kategorî kirîye.

Zimanên fermî yê dewletê lê di karê Yekîtîya Ewropa de nayê bikaranîn;  
Îrlandî

Zimanên yên kêm hejmar, mirovên bê dewlet ku li Yekîtîya Ewropa dijîn;  
Breton

Zimanên yên kêm hejmar û bê dewlet ku li du û zêdetir welata dijîn;  
Katalan

Zimanên ku li welatekî de kêmanîyê lê welatekî din de zîmanê zedeyî ye:Elmanî

Ne zimanên heremîne, ev ziman bi giredayî çandî ve tê xeberdan; Sîntî,  
Yîdişî (O'connel, 2000)

Weqta em her du pênaseyên dinerin dîyare ku statuya ziman bi dewlet re hatiye giredan. Zimanê dewletê di jiyana rojanê de her alîyê ve tê bikaranîn. Lê zimanê ne xwedîye dewlet hedî hedî jiyana rojane derdikevin û lawaz dibin.

Di peşîya Kurdî de astengîya herî mezin makêqanûna Tirkîyê ye. Di benda makeqanûna 42 ya de “Zimanê devleta Tirkîyê Tirkî ye û ji xeynê zimanê Tirkî bi tu zimanî di sîstema perwerdehîyê de wek zimanê dayîkê nayê hînkirin.” Ev mafên di dehsalên dawî de hatîyê dayîn bîngehe wî ne makeqanûnin yêkcar bi hukumetê ve giredayîne û hukumetekî din were dikare ev mafên hatinê dayîn bistîne (Înal, 2012).

Cuma Çîçek lekolînên xwe yê li ser zimanê Kurdî tê zanîn. Ji bo rewşa Kurdî li Tirkîye wisa gortîye.

Li gorî krîterên xebatên lînguîstîk ên neteweyî, dema zimanek derbasî nîfşên nû nebe, ev tê wateyê ku ev ziman xetereyê de ye. Li gor Wurm ji bo zimank hebûna xwe bidomîne divê herî kem sedî 30 yê zarokan vî zimanî hîn bibin. Kurdên ku bi zimanê Tirkî bikartînin roj bi roj zêde dibin. Ji damezrandina Komara Tirkiyeyê vir ve zimanê kurdî li her warên jiyandî hatiye qedexekirin, di nava malê de hatiye hepskirin. Di van salên dawîn de bi pêşketina navgînên(alavên) ragihandinê yê girseyî, zêdebûna dibistan û derfetên perwerdehiya bi tirkî (bi taybetî jî di asta dibistanên seretayî de) zimanê tirkî êdî ketiye nava malan jî. Zimanê kurdî roj bi roj vê qadê jî winda dike û êdî di nav malan de jî zimanê kurdî nayê bikaranîn. Ev pêvajoyê gelek pêş ve çûye û encam jî girtiye ku êdî li gundan di nav ciwanan de jî zimanê tirkî dibe zimanê yekemîn. Mixabin xebatên berfireh yê ku em van sînoran fêhm bikin têra xwe nehatine kirin. Di lêkolîneke Zanîngeha Dîcleyê de ku sala 2005 an de li neh bajarên Başûrê Rojhilatê Tirkiyê hatiye kirin, her ku rêbaza lêkolînê û hîlbijartina mînakên mijara nîqaşê be jî derketiye holê ku di jiyana rojane bixwe de jî rêjeya axaftina kurdî tenê ji sedî 32,8 e. Li aliyê din, tenê bi çavdêriyê hêsan ya li herêma Kurdan, mirov dibîne ku hema bêje li nav her malbatekê ji mezinan heta digihîje zarokan bikaranîna kurdî ber bi rêjeya sifirê ve diçe. Wekî mînak, her çiqas zimanê rojane yê 40-50 saliyên kurdî be jî piraniya wan tirkî jî dizanin. Piraniya nîfşê ciwan tirkî bi kar tînin, hejmareke girîng jî wan jî kurdî fêhm dikin û kêmkirî zêde dikarin kurdî biaxivin. Li aliyê din li derveyê herêmên gundan tevahiya zarokan bi tirkî dipeyivin. Pir kêmkirî jî wan bi kurdî dizanin. Rewşeke wisa xeternak heye ku em ji xwe qet nikarin qala xwendin û nivîsandina kurdî jî bikin. Di şert û mercên ne wekhev de tekilî danîna bi çandekê din re û pêvçûnên çandî ku ji encamên ve tekilîdananîne derdike holê, sedemeke bingehîn e ku zimanekî dixwe xetereyê. Bêguman ev tekilîdanîna wekî pêvçûna ziman xwe nîşan dide. Di vê rewşê de ku jê re temasa zimên(language contact) jî tê gotin, endamên çanda bihêz û biqewet ku bi zimanekî diaxivin, nifûz, heza leşkerî, aborî, ya wan hîn baştir e, ew hêman zorê dide ku zimanên din serdest dibe (Çîçek, 2013).

Li gor rapîsîya Rawastê<sup>3</sup> datayên balkêş ev in. Rejeya kesên ku dikare biaxive, bixwîne û binivîsê tinê %18'e. Ango %82 van kesên xwendin û nivîsin nizane. Herwiha bi başî kurdî diaxafin yekcar %44 e. Rejeya axaftina bi hevalan re kesên ku gelemperî diaxivin %15 e. Kurdî di nivîsîn, xwendin û axaftina jîyana rojane de çikas lawaz jî be daxwaza hînbûna kurdî li nav gel pileyekî mezin %86 e. Li gor me ev pile nîşe dide

---

<sup>3</sup> Di van dehsalên dawî lekolînên li ser rewşa kurdî zêde dibin. Yek ji van lekolîna Rawest e. Rawest sazîyek sîvîl e û di 2018 de li dîyarbekirê hatiye ava kirin. Rawest bi taybetî lekolînên xwe yê li ser Kurda pêş dikeve. Rawest meha adarê di 2019 de lekolînek li ser rewşe zimanê Kurdî kirîye. Ev lekolîn di bajarên Dîyarbekir, Mêrdîn, Wan û Rihayê de hatiye kirin û di vê lekolîne de 600 kes cih digire ku ev kes temenê xwe ve li navbera 18-30 de ne.

ku gel heta neha jê bawerî bi zimanê xwe tînin û îmkân, derfet digerin. Pirs li ser fermîbûna ziman hatiye kirin û di totalê de %85 gotiye ku zimanê Kurdî divê fermî be. Rêjeya guhdarkirina muzîka Kurdî %76.5 e. Dîyare kesên ku kurdîya wê lawaz be jê muzîka Kurdî tercîh dike. Herwiha guhdarkirina nuçê bi zimanê Kurdî li gor muzîka Kurdî lawaz e. Nivê zêdetir nuçeyên bi zimanê Tirkî tercîh dikin. (Rawest, 2019)

## 1.2. BIKARANÎNA TV WEKÎ AMURÊ FÊRKIRINA ZIMANÊ

Çaxa zaroktiyê yek jî tiştê herî balkêş hînbûna ziman e. Di çend sala de zarok ferhenga xwe ya kelîmê mêzin dikin û hakimê tevlihevîya strûktûra zimanê xwe dibin. Hînbûna ziman herî hêsan di weqtê zaroktiyê de mimkîn e û di hînbûna ziman de faktorên cur be cur hene. Li gor lêkolînan irsiyet, zayend, fîzyolojî, tendurîstî, derdora civakî, malbat, zîrekî û pêşveçûna zîhnî, faktorên temenê(emrê), bandora peşketina ziman dikin (Aslan, 2019). Gelek zanyar li ser vî mijarê lekolîn kirini û teorî amede kirine.


Çend nêrîn û ekolên sereke yên ku ziman pênase kirine û li ser binyad û geşedana wî serê xwe êşandine hene. Teorîsyenên herî navdar ên van ekolan wekî Noam Chomsky, Jean Piaget û L.S. Vygostky ne. Ji bilî van kesan ên wek Skinner, Brunner û Hill jî nêrînen xwe yên li ser geşedana ziman vegotine. Nêrîna psîkolînguîstîk ku zêdetir bi Chomsky tê zanîn di hebûn û geşedana ziman de pêkara bîyolojîk bingeş dibîne. Li gorî vê nêrîne, zarok dema ku tê dinê di ber qabiliyetên xwe yên din re programeke heyî ya ziman jî di xwe de dihevine. Lê tesîra derdorê ya ziman jî înkâr nake. Nêrîna sosyolînguîstîk an jî pragmatîk ku zêdetir bi Vygotsky tê zanîn tesîra civak û komaleyetiye ya li ser ziman vedikole. Li gorî vê nêrîne zarok ji bo ku bikeve nav civakê û bibe perçeyek ji civakê, ziman fêr dibe. Li gor Vygotsky jî çavkaniya pêkarên ziman ên wek têgeh, fikir, qabiliyet û helwest derdor e. Nêrîna din jî ya Piaget ye ku li gor wî ziman bi hevkarîgeriya irsiyet û derdorê pêk tê. Zarok dema ku tê dinê qabiliyeta ziman di xwe de dihevine û piştî wî hewcedariya bikaranîna ziman dike (SUBAŞI, 2014).

Zarok ji emrê biçûk dest pê bike heta bi dehan salan weqtê xwe bêtir ber TV û alavên ragihandinê yê audîovîsuel(dîtîn-bihîstin) derbas dikin. Çi salên peşiyê mektebê, çi salên mektebê, çi salên piştî mektebê ev rewş zêde na guhere. Behna zarokan li ber meteryalên audîvîsuel teng nabe û bi keyfî xweşî bala xwe didin.

Daxwaza keşîfkirina tiştên veşartî û hesta meraqê ya di zarokan de li beramberî mezinan zêdetir û bêserûbertir e. Ji ber egera ku televîzyon van her du hestan, baş bi kar tîne, lewma bûye amûreke medyayê ya herî berbiçav. Li ser peywendiya zarok û televîzyonê gelek lêkolîn, çavdêrî û pênase hatine kirin. Bi giştî hatiye gotin ku aliyekî balkêş û cazîbê televîzyonê ew e ku bîrbirî û serwestiya mirovan di kûantûmeke yekdengî de kûr dike. Dîmenên birqonek û guhêrbar, deng û muzîkên curbicur, tevgerên jinişkave û dubareyên dilaramkirinê yên li pey hev û ziman û karakterên herî zêde nêzî mirov jî li van hemûyan bar dibin û mirovan dikişînin nava xwe. Televîzyon di nav amrazên medyayê de ya herî berbiçav e û amrazên din ên medyayê jî naveroka xwe li gorî naveroka

televîzyonê dadigirin û amade dîkin. Herwiha zarokên ku nikarin xwe bigihînin amrazên din, zêdetir bala xwe didin televîzyonê. Bikaranîna televîzyonê li beramberî amrazên din zêdetir û berbelavtir e. Ev rewş ji ber vê yekê ye ku di temaşekirina televîzyonê de şert nîne ku mirov xwendin û nivîsandinê bizane ku ev ji bo hin kesan asteng e. Lêbelê televîzyonê ve astengê ji holê radike. Herwiha di beramberî temaşekirina televîzyonê de hem ji aliyê ked û xebatê ve tu zehmetiyek tune ye hem jî li gorî amrazên din zêdetir fersenda xwemijûlîkirin û rehethîskirinê dide mirovî. Xaleke din a ku televîzyonê zêdetir derdixîne pêş ew e ku di televîzyonê de hem dimen hem jî deng bi hev re ne û ev tişt cezbedariyê zêdetir dike. Li gorî hin lêkolînên Işliyen, balkêşiya televîzyonê ji bo zarokan piştî 6 mehiya wan dest pê dike. Piştî ku zarok bûn 3 salî êdî temaşekirina televîzyonê ji wan re dibe weku xûy û rojê herî kêrêm nêzî saetek an jî du saetên xwe bi temaşekirina televîzyonê re diborînin. Berî 4 saliya zarokan cazîbeya televîzyonê ji bo wan wêne, muzîk, reng û tevgerên tê de ne û piştî 7 saliya zarokan fêhmîkirin û têgihîştina wan geş dibe û piştî 12 saliya wan jî êdî bi temamî dikemile ku ev yek jî dibe bingeh ji bo lêgerîna maneyê di bernameyên televîzyonê de. Di vê çarçoveyê de dîsa Işliyen encamên anketekê ku li ser zarokên di navbera 4-6 salî de li Amerîkayê hatiye kirin, vediguhêzîne ku ji van zarokan pirsîne: “Hûn zêdetir ji kîjanê hez dîkin? Ji televîzyonê yan ji bavê xwe?” Li beramberî vê pirsê sedî 54 ji zarokan gotine ku em ji televîzyonê hez dîkin. Dîsa di sala 2006an de ji aliyê RTÛKê ve bi navê “Xûyê Televîzyon temaşekirinê di Zarokên Serdema Dibistana Navîn de” li ser raya giştî lêkolînek hatiye kirin. Di vê lêkolînê de zarokên 7-10 salî % 67,2 ji wan, zarokên 11-14 salî % 62,4 ji wan gotine ku em di dema xwe ya vala de ji televîzyon temaşekirinê hez dîkin. Encameke din a vê lêkolînê jî ew e ku zarok dibêjin ku tesîreke neyînî li me nake. Dîsa di vê lêkolînê de hatiye pirsîn ku hûn çima televîzyonê temaşê dîkin? Bi giştî bersivên ku dane ev in: ji bo kêfxweşiyê, ji bo dewlemendkirina alema xeyalê, agahdarî û fêrbûn, piştgirî ji bo perwerdeyê, ji ber betalî û bêserûberiyê û hwd. (Subaşî, Gîrr û Gallî Mindilani Kurd, 2018)

Rasti nişa me dide ku gelek zarok di van rojan de dinyaya medyayê ji dinyaya kîteba çêtir balkêş dibîne. Li gorî lêkolîna Tucker; “Li Kanada zarok heta ku here zanîngehe rêjeya navendî(averaj) 500 zêde tir fîlmê direj dinêre û ev teqabûlê 15000 seet dike lê dibe ku zarok heta zanîngehê tinê 50 kîtêb bixwîne. Di salên 1980 de rejeya navendî Brîtonek wextê xwe 5 cara zêdetir li ber televîsyonê ji xwendina kîtêbê diborîne. Li Fînlandayê di salê de 3000 bernameyên bîyanî tê temaşê kirin ku ev rojê de 7 bername zêdetir dike. Ev wext li ber kîtebê were xesap kirin 200 romanê 300 per dike.” Medya roj bi roj cihê kîteba û metaryalên klasîk digire û ji bo di pêşveçûna zaroka de qadek muhîm tir dibe (O'Connell, 2000).



Tablo 1.1 Kona Hînbunê (1969)

Li gor lekolîna Edgar Dale mirov tiştên ku dizanin %83 bi dîtin, %11 bi seh kirin, %3.5 bi behn kirin, %1.5 bi destdan, %1 bi tamkirin re dest dixin. Herwiha bi şartê ku



dem were sabîtkirin mirov %10 xwendinên xwe, %20 seh kirinên xwe, %30 dîtînên xwe, %50 dîtîn û sehkirinên xwe, %70 gotinên xwe, %90 kirin û gotinên xwe bi bîr tînin(Tablo 1.1.) Li gor van datayan(daneyan) çikas organên hîskirinê tevl bibin rejeya bandora hînkirinê zêde dibe (Kuşçu, 2017). Di meteryalên audîvisuel de hem çav hem guh bi hev re dişuxulin. Ev tişt qîmeta metaryalên audîvisuel di hînkirina ziman de zêdetir dike.

### **1.2.1. Zarok TV û Şêwaza Weşanê**

Li gor lekolînan çikas sektora televîsyonê fireh an mêzin dibin ewqas jî weşanên bernameyên zarokan zêde tir dibin. Di dehsalên dawî de li hemû dewletên pêş kanalên zarokan yê tematîk hatiye vekirin. Cara ewil di Emrîka de Nickelodeon, Turner Cartoon Network, Dîsney Channel û Fox kîds ketina weşanê. (Efe, 2014)

Kanalên tematîk yê zarokan li ser zarokan gelek bandor dikan. Gelek şîrket bi rêya karakterên yê filmê kartonî dixwazin berhemên xwe bidin firoşîn. Subaşi vî rewşî wisa rave kirîye.

Filmên zarokan ku alemeke razber di nav alemeke şenber de pêşkêşî zarokan dikan, bi rêya karakterên xweser, têkiliya hevaltîyê, bi awayekî ferazî pêş dixin, sêwirandinên li dijî hev bi awayekî baş-xerab, rindik-sik û hwd. nîşanî zarokan didin û hesta meraqê û meyla keşifkirina tiştên veşartî di wan de zêde dikan. Herwiha gelek caran ev film, zarokan dibin alemên fantastîk û wan li wir dihêlin ku êdî li her derê û di her rewşê de li ber serên zarokan amade ne ku bûne çîrokên modern ji bo wan. Ev film hatine asteke wisa ku êdî tenê li ser ekranan neman û bi rêya karakterên xwe çî li ser cil û bergan çî jî li ser lîstok û çîçikan ketine nav jiyana rasteqîn a zarokan. Li gorî lêkolîneke Saziya Îstatîstîkê ya Tirkiyê heta 10 saliya zarokan, rêjeya temaşekirina filmên zarokan %94 e. Vegotîneke çîrokî, mijar, karakterên afirandî û xwîşîrînkirina van karakteran, di çavên zarokan de bûne egerên herî sereke yê van filman ku ev qas bîn temaşekirin. (Subaşi, Gîrr û Gallî Mindilanî Kurd, 2018)

Di pêncî salên dawî de bi taybetî ji bo zarokan gelek kanalên tematîk vebûn. Hin ji van navtevî ne wek Disney Channel, Cartoon Network hin jî heremî ne wek Zarok TV, Pelîstank TV. Ev kanal 24 seet weşana zindî dikan û zarok roj bir roj zêdetir girêdayî

van kanalan dibin. Zarok TV li Tirkîyê televîzyona yekem e ku bi taybetî ji bo zarokan rojê 24 saet bi sê zaravayên Kurdî (Kurmancî, Kirmanckî û Soranî) weşanê dike. Di sala 2015an de 21ê adarê (newrozê) ava bû û weşana wê heya niha berdewam e. Navenda televîzyonê li Diyarbekirê ye. Zarok TV bi 42 dewletan û amerîkayê tê temaşe kirin (Zarok tv, 2019). Zarok TV bi taybetî Rojhilata Nawîn û Ewropa herwiha wekî Nîjerya, Şîlî, Japonya, Zelendeya Nû welatên cur be cur tê temaşe kirin. Zarok Tv carek li nav 500 kanalên Ewropî de ketîye rêza pêncî. Dîsa carek Zarok Tv li gor rejeya nîvekî(averajî) bûye çaremîn li Swîsre ye. Zarok TV di rewşa awarte de ku piştî darbeya têk çuyî ya 15e hezîranê, bi yanzdeh kanal û radyo tevde di 29 ê îlonê 2016 ê de hat girtin. Di sedema girtinê biryarnamaya qanunî ya 668 ‘kanalên ku dijî ewlebûna neteweyî tê fikirîn dikarin werin girtin’ da nîşandan. (Zarok TV sadece bir kanal değil, ortak bir değeri temsil ediyor, 2019) Zarok TV nîzîkê 2 meh din di 8 çileyê pêşîn 2016 de carek din hat vekirin. (Zarok tv, 2019). Herwiha Zarok TV di 17 û 20 adarê 2018 de ji bo peyvên stranek ceza hatê dayîn. Encama vê cezayê destdanîna %2-%5 dahatuyên reklaman û penc cara sekinandîna programê bû. (Zarok Tv Ye Ceza, 2019)

Zarok Tv li nava Kurda cihê girtîye. Li navbera bînera û Zarok Tv de hevgiradeneke hîsî çebûye. Zarok Tv aliyê çawanî(qualîte), hejmara bername ve roj bi roj peş diçe.

Zarok Tv ji aliyê naveroka xwe ve televîzyoneke pir dewlemend e ku mirov dikare bibêje hêdî hêdî xwe digihîne standardên cîhanê di vî warî de. Herwiha dema mirov ji destpêka weşana wê ve wê bişopîne, mirov dê bi rehetî bibîne ku pêşketineke mezin tê de çebûye, Mesela di serî de ji aliyê weşanên xwemalî ve pir kêr bername tê de diweşîyan. Lê îro dema ku mirov vê televîzyonê bi televîzyonên din ên zarokan ên Kurdî re berawird dike, mirov dibîne ku di warê bernameyên xwemalî de ferqeke mezin a Zarok Tv û yên din heye. Bi taybetî jî di bernameyên anîmasyon û bernameyên xwedî karakterên ferazî de ev ferq zêdetir dixuye. Her çiqas vê dawiyê çend bernameyên resen û xwemalî hebin jî kêmasiyên vê televîzyonê zêdetir, neafirandîna karakterên resen ên Kurdî ne û herwiha ji bo zarokên pêşdibistanê kêmbûna bernameyên perwerdeyê ne. (Subaşi, Gîr û Gallî Mindilanî Kurd, 2018)

Zarok TV çikas kanalek tayîbet jî be weşanê xwe li ser hin prensîba didomîne. Di hevpeyvînekê de şewaza weşanê Zarok TV wisa hatiye dîyarkirin;

“Çekirina bernameyê zarokan gelek keyf e, lê ewqas jî rîsk e. Em nikarin vî karî bi tenê serê xwe bikin. Di Medyayên cuda de mesajên cuda dide zarokan. Îroyin li navbera medya û zarokan gelek giran e. Wexta em bername çedikin bi pedagog dixebitin. Di şêwaza weşanê xwe de em bala xwe didin hin taybetîyan. Em dixwazin bernameyê me feyde bide zarokan ku bibin mirovên azad. Zarok divê hûrmet bidin sîrûçtê û zayendê. Di gelek bernameyan de malbat di jiyana zarokan de cihek merkezî digire. Em dixwazin vî biguherînin. Malbat yekcar divê wek heval û rêberek be. Zarok divê bikaribin axivîn ji bo tiştên jiyana xwe bandor bikin. Di derbarê dûblajê de pirsgireke wisa kanala me de çebû. Dûblaj karekî zanyarî (profesyonel) ye. Gelê din di dehan salan berê dest pê kirine. Heta ku di salên 1900 dest kirin hene. Nik me nû ye. Herwiha wexta girseyê armançkirî zarok bûn karê mirov bêhtir zor dibe. Peyvên tê bikaranîn gelek muhîm e. Di karê dûblajê de kêmasîyê karkeran hene. Lê ev saleke me hin karker peyda kirin. Piştî dûblajê tê kirin em di cih de naweşînin. Em komên zanayên kurmançî û zazakî dixebitin. Ev metin gelek cara alîye wan tê kontrol kirin, redaksyon kirin. Eger pirsgirek hebe cardin li ser nîqaş dikin.” (Zarok TV sadece bir kanal değil, ortak bir değeri temsil ediyor, 2019)

Çend ji bernameyên dûblajkirî ku di Zarok Tv de tên weşandin, ev in:

- Dema Macerabaziyê: Ev bernameya ku ji 52 beşan pêk tê li ser têkiliya hevaltiyê û hesta parvekirinê hûr dibe. Jake yek ji lehengên filmê ye ku ew kûçikekî pîr û zana ye û lehengekî din jî kurikekî zarşêrîn ê bi navê Finn e.
- Rêzikên Angelo: Ev rêzik ji 78 beşan pêk tê. Naveroka vê der barê macerayên zarokekî bi navê Angelo û hevalên wî de ne.
- Mêşhingiv Maya: Ev rêzik ji 102 beşan pêk tê ku li ser karakterên dijber ava dibe. Di vê rêzikê de karaktereke bi navê Maya heye ku ew şûm û nehs e û li dijberî wê karakterekî bi navê Willy heve ku ew jî tirsonek û bi fikar e. Ev bername der barê macerayên van her du karakteran de ye. Herwiha karakterekî bi navê Philip heye ku rola wî jî xelasker e. Ev bername bi tameke çîrokî dixwaze hezkirina ajelan bixe dilê zarokan û herwiha bi karakterên li dij hev bala zarokan zêdetir kûr û hûr bike.
- Beqên Şopger: Ev bernameya ku ji 26 beşan pêk tê, zarokan ji cîhana rasteqîn dibe alema fantastîk. Macerayên heşt beşan di daristaneke bisêhr de tê vegotin ku bi vî yekê dixwaze sînoren xeyalên zarokan fireh bike.
- Daristana Gulbihar: Ev rêzik jî ji 52 beşan pêk tê û der barê têkiliyên hevaltiyê de ye.

- Taqîgeha Dexter: Ev bername ji 77 beşan pêk tê û di vê bernameyê de aksiyon û honakên zanistî cih digirin û tê de qala serboriyên zanyarekî biçûk ê bi navê Dexter tê kirin.
- Mala Fosteran: Ev rêzika ku ji 79 beşan pêk tê li ser hevalên xeyalî hatiye sêwirandin. Ev bername dê zêdetir bala zarokên di serdema egosentrîk de bikêşe.
- Gumball: Ev rêzik ji 92 beşan pêk tê û qala alema bikelecan a Gumball dike ku ew pisîkeke dozdehsalî ye.
- Stêrka Laurayê: Li ser çîrokeke sêhrîn û razdar tê sêwirandin û bi tevahî ji 52 beşan pêk tê. Ezmanê ku her gav di xeyalên zarokan de îcar bûye qada wan.
- Çolistanên Oscar: Ji 78 beşan pêk tê. Serboriyên lehengê bi navê Oscar tê vegotin. Ev bername zêdetir jiyana li qadeke cuda yanî jiyana çolê nîşanî zarokan dide.
- Pocahontas: Qala çermesoran dike û ji 26 beşan pêk tê.
- Şinok: Navê resen ê vê bernameyê The Smurfs e ku qala jiyana komunal dike. Ev bername rexneyek e li ser pergala kapîtalîst. Karakterên ji hev cuda yên vê bernameyê û senaryoya wê
- Sifinc Bob: Ev bername ji karakterên grotesk pêk hatiye û qala serboriyên li giravekê dike. Ji 100 beşan pêk tê.
- Ji bilî van rêzefilman gelek rêzefilm û filmên sînemayî jî hene ku hin ji wan ev in: Avatar, Cedric, Nexweşxaneyê Serê Gir, Pablo: Roviye Sor ê Piçûk, Mig Dibêje, Louie, Baxçeyê Ajelan, Corneil&Bernie, Bajarokê Mirîşkan, Hespikê Avê, Trotro, Tintin, Yakari, Gars eld, Mala Periyên, Darbirên Hêrsok, Road Runner, Tom û Jerry, Billy&Buddy, Lmn's, Pînokyo, Raindrop, Moby Dick, Macerayên iham Ji mendin Tin i jak ku tevger Gulliver, Çîroka Bêdawî... û hwd. (Subaşî, Girr û Gallî Mindilanî Kurd, 2018)

### **1.3. DÎ FÎLMÊN KARTONÎ YÊN DÛBLAJKIRÎ DE ŞEWAZA WERGERA METNÊ, TEKNÎKÊN WEGER Û HEVSENGÎYA DÛBLAJÊ**

Bernameyên kanalên tematîk yên zarokan bi berhemên kurdî û berhemên bîyanîyan pêk tên. Berhemên bîyanî bi rejeyêkî ne kêr cihê xwe di van kanalên de digirin. Bitaybetî berhemên anglo-amerîkan û ewrûpî di weşana kanala zarokan de bi hêz e. Çimkî çekirina van berhemên hewceyê mesrefek mêzin, hûnermendên baş, karkerên zanyar, alavên teknîkî û hwd ne. Eger ev derfet di destê we de tune be hûn nikarin reqabetê bi kanalên din re bikin. Ji bo vê yekê kanalên tematîk yên zarokan, van berhemên bîyanîya distînin û bi rêya wergera kurdî herwiha hin pevajo yê din di kanalê xwe de diweşînin û bi rêya van berhemên, zarokên kurd xwe digîhîne asta çanda popûler ya dinyayê û berhemên herî balkeş yên welatê din. Bi rêya wergerê bi derfetên biçûk ev kanal karên gelek bi bandor dikin û bala zarokan dikişînin. Gelo wexta wergerên metin ji bo fîlmên kartonî were kirin divê stratejîya me çi be? Me ji bo stratejîya xwe yê wegerînê li ser teorîya ‘‘Skopas’’ ava kir. Em ê di binbeşê de behsa teorîya skopos û stratejîya xwe bikin.

Ev teori di 1978 de ji aliyê teorisyenê Alman Hans Wermeer ve hate amadekirin. Maneya ‘‘skopos’’ armanca e û peyvek yewnanî ye. Di vê teorîyê de werger divê li gor armanca wergerîna metnê û çanda jêder were kirin. (Yıldırımçakar, 2016).

Wek armanç em dixwazin wexta werger ji bo bernameyên zarokan were kirin divê armanca me ‘‘pêşvebirina qabîlyeta ziman’’ be. Em ê li gor vê armancê di pevajo ya amadekirina fîlmê kartonî binirxînin. Di pevajo ya wergerînê metinê de gelek faktor hene. Em ê van faktora ‘‘faktorên li nav nivîsê de’’, ‘‘faktorên li derveyî nivîsê de’’ bisinîfînin.

### 1.3.1. Faktorên Li Nav Nivîsê De

Sere ewil dive wergêr her du ziman û çandê jî baş bizanin. Li gor Îbrahîm Seydo Erdogan divê wergêr ‘‘bi ruhê zimanê jêder’’ baş bizane (Erdogan, 2013). Wergêr ew bandora zimanê jêder xwînera dîkin kêr zêde heman bandorê divê xwînerê xwe jî çêkin. (Günay Köprülü, 2013) Girseyê armançkirî ji yek faktorê herî muhîm e. Li vê dê girseyê armançkirî zarok in. Peyva zarok ji bo emrên li navbera 0-18 tê bikaranîn. Em ji bo 2 salîyan re jî û ji bo 16 salîyan re jî dibejin zarok. Ji bo vê yeke divê em girseyê armançkirî bêhtir spesîfik bikin. Ji bo dîyarkirina emrê zarokan gelek sinifandin hatiye kirin. Di malperek Emrîkî de emre zarokan 2-6, 7-14, 14-18 hatîye sinifandin (Cartoonratings, 2020). Herwiha ji bo kîtebên zarokan jî 1-3, 4-6, 6-8, 8-10, 9-11, 11-12, 13-15 hatiye sinifandin (Çiftçi, 2013). Wexta werger were kirin divê girseyê armançkirî neye bîr kirin. Lê carina ji bo hin sedemên tîcarî û hin sedemên din di bernameyê zarokan de ev spesîfikasyon naye kirin. Wek mînak carina ‘‘zimanê mêzina’’ (adult language, yetişkin dili) tê bikaranîn ji bo ku hem mêzin hem zarok lê temaşe bikin. Vî avayî kanal dixwazin xwe bigîhînin girseyek firehtir. Ji bo vê yekê her cureyên hevokan, xenekan, gotinê peşîyan, biwejan, hin leyustukên zimanê di bernameya zarokan de xuya dîkin. Bêguman ne mûmkîne ku zarok van fehm bikin. Ya rast mêzin wek zarokan demên xwe ber televîsyonê li malê naburînin. Wexta malê bin jî terciha wan ya yekemîn ne bernameyê zarokan e. Ji bo vê yekê armanca wergêr divê zarok bin, ne mêzin. Herwiha çikas di orjînalê bernameyê de ev spesîfikasyon hatibe piştguh kirin jî derfet hebe divê wergêr heta jê were li gor gîrseya armançkirî werger bike. Ev faktor li gor me gelek muhîm e. Çimkî di zaroktayî de zanîna hejmara peyvê li gor emrê diguherin. Bêguman zarokên pênc salî ji yek salî zêde tir peyv dizanin. We gavê wexta werger were kirin peyvên tînan hilbijartin divê li gor girseyê armançkirî bin ku zarok bikarin fehm bikin û bikarin reaksiyon bidin. Divê li navbera zarok û bernameyê de tekîliyê hîsî çêbibe.

Navbera wergerên berhêmen audîvisuel wek fîlmên kartonî, stran, çîrok, belgefîlm û wergerên di berhêmen edebîyatê de hin cudahî hene. Di wergerên edebîyatê de tîne ‘‘nivîs’’ heye lê di wergerên ji bo weşanan de ‘‘nivîs’’ û ‘‘dîmen’’ heye. Wexta wergerê metne tê kirin, dîmen jî wek faktorek bandorê wergerê dike. Wexta xwîner

berhemek edebî dixwînin heman demê jî van tiştan xeyal dikin lêbelê berhemên audîvusuel ve tiştê ji bo temeşevana dikin. Li tê de hem dîmen heye hem deng. Wexta werger tê kirin divê wergêr bala xwe bide dîmenê jî. Metninên audîvusuel gelemperî li gor axaftinê tê çêkirin. Çimkî filmê kartonî de her tim dîyalog hene. Tiştê ku tê werger kirin ya rastî dîyalog in. Lê di metninên edebî de dîyalog li gor metninên audîvusuel kem in. Yanê metninên audîvusuel bi xwe hin tayîbetîyên wî hene. Wexta werger tê kirin divê bi zimanê axaftinê werger were kirin (Şirin & Mümtaz, 2017).

Friedrich Schleiermacher di lekolîna xwe ya binavê ‘‘ Li ser şewazên cuda yê wergerê’’ de behsa gîrîngîya têkilîya cureyê metin û şewaza wergerê dike. Li gor Schleiermacher cureya metin gelemperî du şiklî disinifin. (Göktürk, 2018). Yekemîn metinên hûnermendî-zanyarî, duyemîn metinên li ser karên rojane (working life, iş yaşami) ye. Di karên rojane de mijar ‘‘tişt’’ e yanê made ye ji bo vê yekê mane her tim yêk e û bi peyv û hevokên standart tê bikaranîn. Di van metina de mane ji bo şîroveyên cuda re girtîye. Metinên hûnermendî-zanyarî, metinên resenin û bi zimanek subjektîv tê nivîsîn. Ev metin her tim xwe nû dikin û bi formatên nû ava dikin. Li gor Schleiermacher ji bo wergerên van metina du şewaz hene. Şewaza yêkemîn ‘‘birina xwîner li ber aliyê nivîskar’’ duyemîn ‘‘birina nivîskar li ber aliyê xwîner’’ e. Li gor wî di wergerên metinên hunermedî-zanyarî de divê şewaz birina nivîskar li ber aliyê xwîner be. Çimkî metinên hunermedî-zanyarî bi zimanek afirîner tê nivîsîn. Li hundirêde formên standart yê peyv û hevok tunin. Metinên audîvusuel jî, metinên hunermedî ne û divê wergera mane bi mane were kirin. Divê wergêr nivîskar ber aliyê xwînera bibe û ji wergera raste rast dûr bikeve.

Di filmên kartonî de wexta karakter diaxivin pirsgireka demê çedibe. Ev karakterên ha axaftina xwe di çikas demê de xilas dikin? Li gor vê demê wergêr peyvên xwe hildibijire û hevokên xwe çêdike. Wekî din li gor hejmara heceyên peyvên jêder, hevokên xwe çêdikin. Ev faktorek neyînî ye. Çimkî çikas wergêr ji bo hildibijartina peyva azad be ew qas metin bêkemasî dibin.

Mijara yek ji herî balkeş jî nîqaşa li navbera bîyanikirin(foreignization)-ehlîkirinê(domestication) ye. Bitaybetî di sedsala dawî de bi peşveçûna teknîkî, bi quwetbûna dewletên netewî gelek ziman ketin bi bandorek nexweşî yê. Li gorî Michael Cronîn hemû ziman li ber zimanê ingilîzî bûye zimanê kemanîyê (Yıldırımçakar, 2016). Me beşên borî de behsa rewşa Kurdî kirîbû. Ji bo vî rewşa neyînî gelek zimanzanê me wexta dinîvisin, werger dikin heta ji wan were peyvên alîyê etîmolojîk ve kurdî bikartînin. Ango dixwazin Kurdî bi bandora Tirkî, Erebî, Farisî derêxin û zimanek sedêsad kurdî bikarbînin. Peyvên di Kurdî tune be peyvên nû diafirînin. Lê eger em bixwazin karê xwe de serkeftî bin divê em rêya zanyarî hilbijêrin. Bi taybetî li ser vê meselê de nerînên Even-Zohar gelek balkeş in. Rêbaza polîsîstemê yê teorîya wergerê Even-Zohar îcat kiriye. Even-Zohar zanyarekî îsraîlî ye. Yek ji armaca we jî hêz kirina zimanê Îsraîlîye. Li gor wî werger di hêz kirina zimanê de gelek muhîm e. Werger di edebîyatê de cihe wî herdem diguhere. Carina werger cihekî ‘‘merkezî’’ digire carina cihekî ‘‘perîferal’’ digire. Ev tişt li gor hêza ziman diguhere. Ziman eger lawaz be werger di edebîyatê cihekî ‘‘merkezî’’ digire. Wê gavê berhemên werger, yê ne werger zêdetir in. Ji bo vê yekê ziman dikeve bandora bîyanî ya. Ev berhemên werger, bîyanîbûna ziman zêdetir dikin lê ewqas jî hêza ziman zêdetir dikin. Ev pevajo heta tê we astê ku edî rejeya berhemên werger di edebîyatê de dadikevin. Berhemên heremî(lokal) edî cihekî ‘‘merkezî’’ digirin û berhemên werger di edebîyaê de cihekî ‘‘perîferal’’ digirin. Bandora bîyanîya li ser ziman dadikeve. Wek mînak berhemên werger di Emrîkê de tinê %2 ye. (O'connel, 2000) Çimkî zimanê ingilîzî gelek hêz e. Tu xewceyî berhemên werger tune ye.

Zimanên lawaz bi rêya wergerê xwe nû dikin, peyvên xwe zêde dikin û qabîliyeta xwe ya edebî pêştir dixin. Herwiha wexta werger were kirin divê wergêr li gor berjevendîyên metinê armanç(Kurdî) û çanda armanç biçin. Metnê û çanda jêder divê di posîzyona duyemîn de bimînin. Wekî din ziman eger di statuyek lawaz de be wergêr bêhtir dikare elastîk be. Metnê armanç divê li nizîke metnê jêder here. Ango eger hewce be wergêr divê peyvên biyanî bi hesanî di metinê de bikarbîne. Wexta em bixwazin zimanê Kurdî hêztir bikin divê em ji bo peyvên bîyanî bêhtir elastîk û vekîrî



bin. Wek mînak hin peyvên erebî çend sedsal bere ketine li nav Kurdî de. Ne xewceye mirov ji bo wan peyvan, peyvan nû efirînê an ji soranî transfer bike. Peyva ‘‘kîtêb’’ di temamê bakurê Kurdistanê de tê fehm kirin lê em nikarin ji bo peyva ‘‘pirtûk’’ vî bejin. Em ne dîjî pevajo ehlîkirina peyvan e. Kenge zimanê kurdî hêz bibe wê wextê em dikarin van peyvan biguherînin û ji zaraveyê din peyvan transfer bikin.

Di wergerê de pirsgirekê din ne standartbûna zimanê Kurdî ye. Xeynî Başûrê Kurdistanê tu statûyek Kurda nînin. Yek ji encamê ve zimanek ne standart e. Gelek heremê Bakurê Kurdistanê ji bo yêk mane cur be cur peyv tê bikaranîn. Wergêr an edîtor heta destê wî were divê peyvên hevpar bikarbîne ku hejmarek fireh zarok peyvan fêhm bikin.

Di lekolînek katalanî de xuya dike ku werger çikas li ser zimanê rojanê here ew qas bandora wî zêdetir dibin. Wexta werger were kirin divê wergêr nerînên îdeolojî dûr bikevin û behtir xwe nizîke zimanê kolanan bikin. Çimkî zarok di kolanan de mezin dibin û zimanê wan zimanê rojane ye. Ji bo ku zarok bikarin zimanê xwe li ber bernameyên televîsyonê de hêztir bikin divê wergêr zimanek ku zarok bi hesanî fehm bikin hilbijirin (O'connel, 2000).

Çi cureyên berhemên zarokan bin ji alîyê mezinan tê amedekerin. Nivîskar, derhêner, edîtor, weşaner, wergêr, dê-bab, mamoste hwd. hemû mezin in. Di amedakarina berhemên zarokan de hemahema bandora zarok tunin. Ev jî li navbera zarokan û mezinan de asîmetrî çêdikin. Hin sektor vî pirsgirekî çareser kirine. Yek ji wan sektora çîkolata ye. Peşî çîkolata were belavkirin zarok tehm dikan. Yanê li gor biryara zarokan çîkolata tê çekirin. Lê bitaybetî di berhemên nivîskî de em alîkarîya zarokan nastînin. Ji bo vê yekê îhtîmalek zêde di berhemê de zimanê mezina tê xuya kirin. Qabîliyeta zimanê zarokan û mezinan ne wek hev e. Divê nivîskar/wergêr li gor asta qabîliyeta zarokan here û bizanibe zarok di kîjan emrî de çawa diaxivin û heta ji wan were zimanê mezinan dûr bikevin. Herwiha wexta werger ji bo zarokan were kirin eger nêrînên polîtîk, dînî, netewî, çandî hwd. zêde were bikaranîn ango bi ziman re zêde were leyistin dibe ku zarok bernameyan xweşik fehm nekin û feyde zêde jê nestînin.

Li gor Wermeer werger divê li gor çanda armanç were kirin. Wexta di metinê de bûyerên çandî hebin, ji xwe ev çand li nav kurda de hebe karê wergêr rehet e. Lê eger ev çand tune be em rastê rast wergerînîn dibe ku zarok fehm nekin. Derfet hebe divê wergêr jê biborin (O'connel, 2000).

### **1.3.2. Faktorên Li Derveyî Nivîsê De**

Hin sedemên li derveyî nivîsê jî bandorê karê wergerê dike. Yek ji wan hîlbijartina wergêr e. Bitaybetî gelek kes karên ji bo zaroka derveyî zanyarî(profesyonelî) dibînin ji bo vê yekê ev kar dikeve destê kesên acemîya(amatora). Lê her kar di majara xwe de hewceyî zanyarîyê ye. Kesên dinivîsin, werger dikin divê agahîyên wan ne tine li ser medya, sinema bin herwiha agahîyên wan divê li ser zarokan jî hebin. Ev pirsgirek çawanîya(qalîteya) wergerê dîyar dike.

Alîyê din seetên şixulê û miqtarê mehaneyê(meas), prestîja meslekê jî bandorekî neyînî çawanîya(quality) wergerê dike. Xeynî van zextên li ser wergêr jî bandora werger dike. Gelek çaran wergêr bi azadî nikarin werger bikin. Serkar û reveberên weşanê dibe ku jê re hin qistas(krîter) deynin. Hin ji van dibe ku renek polîtîk, aborî(marketing), dînî, netewî bin. Ji bo vê wergêr carina ne bi dilê xwe wergeran dikin. (O'connel, 2000)

### **1.3.3. Teknîkên Wergerên Audîvîsuel**

Di dûblajê de merhelaya yêkem wergera metna filmê kartonî ye. Dûblaj peşî her tiştî şixulek werger e û beşek ji wergera audîvîsuel e. Dûblaja filmên kartonî li ser metna werger tê kirin. Weqta wergerê metnên filmê kartonî were kirin; derxistin(omission), foknsîyona hevsengî(fuunctional equivalence), herî nîzîk hemwate(the closest synonym), Ravekirin(Description),Wergera rasterast (literal translation), neologîzatîyon (neologization), dewlemendkirin (enrichment) (Kubkowski, 2013). Dubarekirin (Repetition), Lêanîna ortografîk-guherîn (Orthographic adaptation), Notralizasyon (Neutralization) (Yıldırımçakar, 2016) ev rêbaz tîk bikaranîn.

**Jêbirin (Deletion/ommission):** Di wergerê audîvîsuel de jêbirin herî zêde teknîke tê bikaranîn. Wexta di zimanê jêder de biweş, gotine peşîyan, hin tiştên çandî ku naye fehm kirin hebin dive wegêr van jê bibe. Herwiha hevokên ne ji bo zarokan ango zimanê mezinan û peyvên argo hatibe bikaranîn teknîkê jêbirînê tê bikaranîn. Lê wexta teknîka jêbirîne were bikaranîn dive di maneya armançkîrî de kemasî çenebe.

**Hevsengîya Fonksyonel (Functional Equivalence):** Li gor vê teknîkê çikas di zimanê jêder de hin peyvên bi giredayî çandê ve, hemwateye wê di zimanê armanç de tune be jî peyvên alîye fonksyonê ve cih bigrin hene. Armanca me dîtîna peyvên heman bandorê (tesîrê) bike bibînin. Vê de armanç “bandore” ne “hemwateyî ye”

**Herî Nizîk Hemwate (the closest synonym):**

Ferqa vî teknîkî û hevsengîya fonksyonel ev e. Di hevsengîya fonksyonel de armanca me “heman bandor” bû lê herî nizîk hemwatê de armanç ne tinê “heman tesîrê” herwiha “heman wateye”. Heta dest were alîyê rezimanî û semantîk ve peyv tîn hîlbijirin.

**Ravekirin (Description):** Ev teknîk wexta hevsengîya fonksyonel neye bikaranîn kêr tê. Wergêr, ew peyva ku bikar tîne hinekî rave dike.

**Wergera rasterast (Literal translation):** Wergêr heta destê wî/wê were rêzimanî û peyvê ve giredayî metnê ye. Tu carî strûktûra formal ya metnê bîr nake. Dibe ku encame vê teknîkê alîyê mane ve di metna jêder dûtir keve. Li vê de wergera peyv bi peyv heye. Ango dive ji bo peyvek tinê yêk peyv were bikaranîn. Ev cure di wergera metnên zanyarî de meşhur e. Lê di wergerên metnên fîlmê de zêde nayê bikaranîn çimkî metnên fîlman gelemperî di çanda civatê re giredayî ye. Eger wergera rasterast were kirin ihtimalek mêzin yê maneya metna jêder dûtir bikeve.

**Neologîzasyon (neologization):** Ev teknîk wexta werger tê kirin di zimanê armanç de gotinê hevseng tunebin û wergêr naxwazê teknîka jêbirîne bikaranîne kêr me tê.

**Dewlemendkirin(enrichment):** Ev teknik di wegera fîlma de kêma cara tê bikaranîn. Di vê teknîkê de wexta wergêr bixwazê fehmbar bike hin peyv lê zêde dike û hin cara jî metna orjînal alîyê naverokê ve feqîr be wergêr dîsa hin peyv lê zêde dike. Herwiha carina hestyarên di fîlmê de çetir were bihîsin ev teknîk tê bikaranîn.

**Dubarekirin (Repetition):** Li vir wergêr, dema ku werdigerîne çiqas ji destê wî were heman hêmanê diparêze, naguherîne. Wekî mînak di pirtûkekê de ku peyva 'New York'ê wergerînin kurdî dîsa wekî 'New York' wergerînin, li vir peyvê dubare dikin. Li gorî Aixelia ev stratejî di wergerê de tesîreke arkayîk û egzotîk çê dike. (Yıldırımçakar, 2016) Yanî dema ev stratejî hate bikaranîn biyanîkirin heye.

**Notralizasyon (Neutralization):** Li dewsa vê, navên wekî "*gelemperîkirin*" (*generalization/universalization*) jî tê bikaranîn. Li dewsa peyva ku eger rasterast bê wergerandin wê di çanda armanç de neyê fehmkirin, peyveke "gelemperî" tê bikaranîn. Wekî mînak di hevoka 'Kendine bir *range rover* aldî.' de dema wergêr bifikire ku xwendevan aşînayê peyva *range rover*ê nîn in û nizaninin ku ew cureyeke cîpan e, dewsa wê dikare bêje "Wî ji xwe re *cîpek stand*". Bi vî awayî notralîze dike.

Di wegerên edebî de yekcar metn heye. Lê di wegera aûdîvîsûel de digel metn dîmen jî heye. Weqta em wergera aûdîvîsûel bikin divê em bala xwe bidin dîmenê. Ango li navbera wergera metn û dîmenê de hevsengî hebe. Istwan Fodor cara yekem qala hevsengîyê kirîye. Fodor hevsengî sê beja de disînîfîne.

#### **1.3.4. Hevsengîya Dûblajê**

Bitaybetî fîlmê bîyanî bi du şewaza xwe digîhîne bînera(temaşevana) yêkemîn dûblaj û duyemîn jêrnivîs(subtitle) e. Di şewaza dûblajê de dengê fîlmê(axaftinên fîlmê) ji zimanê jêder(zimanê orjînal) bo zimanê armanç(kurdî) bi hûnermendên dûblajê(voice artist, dubbing artist) ve tê deng kirin. Yanê cara duyemîn tê deng kirin. Dûblaj ne tinê fîlmê bîyanî, hemû cureyên audîvîsûel tê bikaranîn. Fîlmên orjînal li ser bînerên xwe

bandorek dikan. Di dûblajê de armanca me ewe ku heman bandorê bi zimanê kurdî ve bînera bikin. Bîner tu carî zimanê orjînal nabihîsin. Kesên ne xwîner(kesên xwendine nizanin) nikarin filmê bijêrnivîs temaşe bikin. Lê bi şewaza dûblajê film xwe digîhîne hemû kesî. Wekî din şewaza dûblaja gelek bahaye û kareke tîmî(ekîbî) ye. Di vê tîmê de wergêr, derhenerê dengê, hûnermenden dûblajê, teknîsyenê dengê hwd. hebe.

Pevajoya dûblajê gelemperî bi çar qonaxan çêdibe. Qonaxa yekemîn metnê orjînal bo Kurdî tê wergerandin. Ev metina xav e. Qonaxa duyemîn ev metn li gor girseya armançkirî û hevsengîya levê tê adapte kirin. Qonaxa sêyemîn ev metn bi hûnermenden dublajê ve tê deng kirin û qeyd kirin. Di qonaxa dawî de ev qeyd û qeyda orjînal tê senkronîze kirin. (Günay Köprülü, 2013)

Eger dûblajê hevsengîyek baş tune be bîner vî dibîhîsin û ji filmê dûr dikevin. Ji bo vê divê axaftinên listîkvanên filmê û yên hûnermendên dûblejê heman demê dest pê bike û heman demê dawî bibe. Herwiha jest-mîmîk, tonê dengê, leza axaftinê jî di hevsengîyê de gelek muhîm e. Istwan Fodor cara yekem qala hevsengîyê kirîye û hevsengîyê sê beşa de sinifandî ye.

**a)Hevsengîya Fonetîk:** Weqta dûblaj tê kirin divê derxistana dengê me û yê dûmenê de hevsengî hebe. Fodor bitaybetî li vê dê qesta hevsengîya fîlma kirîye. Di fîlman de wexta listîkvan diaxive li gor tevgerên lêvê(devê) hîlbijartina peyvan diguhere. Carina peyv bi dengdar û carina jî bi dengdêr ve dest pê dike. Ev tişt di hîlbijartina peyvan de ji bo wergêr astengî ye. Lê mijara me li ser filmê kartonî ye. Di fîlmê kartonî de hevsengîya fonetîk naye bikaranîn. Ev tişt jî avantajek mêzin dide wergêr. Bi vî awayî em dikarin bi dilê xwe peyva hîlbejêrin.

**b)Hevsengîya Karakterî:** Weqta dûblaj tê kirin divê aliyê kesayetî ve hevsengî hebe; deng, emr, tevger. Di fîlmên kartonî de dûblajê gelek cara zarok nakin. Mezin ji bo zaroka dûblajê dikan. Dengê xwe dişîbînin wek zarokan.

**c)Hevsengîya Naverokî:** Hevsengîya naverokî lihevhatina metna werger û kiryarên aksîyonê di fîlmê orjînal de ye (ŞAHÎN, 2015). Fodor hevsengîya naverokî ji aliyê

fonksiyonê ve nirxandîye. Li gor vê armanca dûblajkirinê filmê û pêdiviyên girseyê armanckirî di çekirina dûblajê de cihên muhîm digirin (O'Connell, 2000). Herwiha bitaybetî di filme kartonî de divê hejmara peyvan û direjîya hevokan hev bigirin ku li gor dûmenê hevsengî çebibe.

#### **1.4. DERHEQA AVATAR Û ŞÎNOKÊ**

Ji bo du sedema, me di projêya xwe de filmê kartonî yê Avatar û Şînokê hilbijartîye. Sedema yêkemîn zanebûna me ya zimanê inglîzî ye ku ev filmên kartonî ji aliyê orjînal ve zimanê inglîzî hatiye çêkirin. Sedema duyemîn jî hezkirana me ya van filmê kartonî ne. Avatar rêze filmek kartonî yê Emrîkaye ku ji aliyê Bryan Konietzko û Mîcheol Dante Di Martino hatiye çêkirin. Cara yêkemîn kanala tematîk yê zarokan "Nickelodeon" di 2005 heta 2008 sê sezon de hatiye weşandin. Reza filma Avatar konseptek nû avakirîye û kêman caran bala xwe daye şowên zarokên yê rojovayî, konseptê Avatar meseleyên şerê, qirkirinê, imperyalîsmê, bêadaletîya li navbera zayêndê, hêzdarkirina jinê, marşînkirinê, zordariyê û pirsên felsefî li derdora qader û pêşerojê dihewîne. Avatar mijara xwe ve dinyayek asyayî nîşa me dide ku hin kes bi qabilîyeta teknîkên şerê yê fîzyokînetîk dikarin hin elementên-av, hewa, ax, agir-şikilbidin. Ev filmê Kartonî li gor bi kombîneya nêrînek Emrîkî û taswîrên Rojhilatê Esiyayê hatiye amedekirin. Ev filmê kartonî lêhengê wek 12 salî "Aang" û hevalên wî re giredayîye ku divê aşîfî û aheng ji bo dinyayê çêkin û dawîya şerê netawa agir ya dijî çar netawa- av, hewa, ax, agir-bînin. Di hevpeyvînek de, Konietzko dibêje: "Bala min û Mike li ser destanên lehengî bû wek Harry Potter, Mîrê gustîlan (Lord of the rings) lê me dixwesta tiştek cureyek cuda çêkin. Me gelek hez anîmasyonê japona, filmê aksiyon yê Hong Kongê û sînemaya Kungfu, yoga û felsefeya rojhilata dûr dikir ku ev hezkirin me beralîyê çekirina îlhama Avatar ve bir". Avatar aliyê bazirganîyê ve serkerftî bû û ew bi bîner, rexnegîran ve hat perijandin ku dîyarîyê derhenerîya hûnerê, mîzah, referansên çandî, karakter û mijarê standîye. Sezona yekemîn gelek serkeftîbû ku Nickelodeon sezona duyemîn û seyemîn jî da çêkirin. Avatar xelata Annie, xelata Genesis, xelata Peabody stnadîye (Avatar: The Last Airbender, 2020).

Rêza fîlma Avatar li gor malpera IMDB di dinayayê de rêza 13 digire. Ji bo fîlmek kartonî serkeftîyek gelek mêzin e.

Kîtêb	Nav	Beş	Dîrokê weşanê	
			Weşana ewil	Weşana dawî
1	Av	20	Sibat 21, 2005	Çileya pêşîn 2, 2005
2	Ax	20	Adar 17, 2006	Çileya pêşîn 1, 2006
3	Agir	21	Îlon 21, 2007	Tirmeh 19, 2008

Tablo 1.2. : Dîrokên weşanê yê Avatar e.

Şînok(The Smurfs) fîlmek kartonî ye Belçîkî ye. Di merkezê de komek(kolonîyek) biçûk, heşîn, mexlûqên wek mirovan heye ku di xaniyên ji şiklên kivarkê(mushroom) de li daristanê dijîn. Şînok cara yekemîn di 1958 de ji aliyê artîsta kartonî Pierro Culliford hatiye çêkirin û danasîn. Ji sedan zêde tir karakterên şînoka hene û navên wan li gor taybetmendîya wan hatiye danîn. Şînok kumên (cap, îng.) frîkî xwe dikin ku nîşeneya azadîya serdema modern e. Şînok bi weşanên xwe yê di 1981 de cihê xwe di çanda nava gel de girtîye. Şînok di navbera 1981 û 1989 de kanala NBC hatiye weşandin. Şînok li nav di fîlmê kartonîyê herî baş de bûye 97. li gor IGN. Şînok re“kokaîna zarokan” hatiye gotin ji bo zarokên salên 1980 mêzin buyîn. (The\_Smurfs, 2020).

## BEŞA DUYEM:

### TEHLÎLA DÛBLAJA KURDÎ YA AVATAR Û ŞÎNOKÊ

#### 2.1. DESTNÎŞANKIRÎNA TEKNÎKÊN WERGER DÎ AVATAR Û ŞÎNOKÊ DE

Me li beşa jor penasêyên teknîkên werger kirîbûn. Vê carê em ê wan bi hin mînakên vê ravebikin. Me van mînaka ji Avatar û Şînokê standîye. Her dû metin jî di pêvekê de hene. Şînok ji zimanê orjîal(Ingîlîzî) hatiye wergerîn. Avatar ji tirkî hatiye wegerîn. Ango ji zimanê Ingilîzî bo Tirkî hatiye wergerîn û paşe zimanê Tirkî bo Kurdî hatiye wergerîn.

##### **Jêbirin (Deletion/ommission):**

*-Well, this work would get done a lot quicker if every- smurf was helping*

*-Heke em hemû bi hev re bixebitin, ev kar ê zûtir xelas bibe(Wergera Şînokê, rêza 12 )*

Li jorê wegera ‘‘Well’’, ‘‘smurf’’ nehatîye kirin. Teknîka jêbirîn hatiye bikaranîn. Li gor wergerê peyvên jor jê were birîn mane naguhare. Li gor dîmen û naverok kemasîyek mezin çênabe.

##### **Hevsengîya Fonksiyonel (Fuctional Equivalence):**

*-Nihayet... amca bu ne demek biliyor musun?*

*-Mala xwedê ava... mamo tu zanî maneya vê çi ye? (Wergera Avatar beşa yêkemîn, Zuko 05:28)*

Li vê de re ‘‘Nihayet’’ wek ‘‘Mala xwedê ava’’ hatiye wergerîn. Her dû peyv jî heman tesîrê çêdikin. Alîyê fonksiyon ve heman wazife dibînin.



**Herî Nizîk Hemwate(the closest synonym):**

*-Looks like we've landed in the ancient "land of the dragon!"*

*-Wer dixuye em hatine Warê Ejderhayan ê Antîk( Wegera Şînokê rêza 4).*

Li jor ‘‘Looks like’’ wek ‘‘Wer dixuye’’ hatiye wergerandin. Wexta em bala xwe bidin ne tinê heman tesîr herwiha di heman wateyê jî dide. Ev teknîk qabîlîyetek baş dixwaze.

**Ravekirin (Description):**

*-2 yıl önce babam ve kabilenin diğer erkekleri köyü bana ve diğer erkek kardeşime emanet ederek ateş ulusuyla yaptıkları savaşa destek olmak için toprak krallığına gittiler. Kimileri avatarın yeniden doğup dünyayı kurtaracağına inanmıyor. Onlara göre çember bozuldu bir kere. Ama ben umudumu kaybetmedim. Avatar mutlaka dünyaya geri dönecek ve dünyayı kurtaracak.*

*-Berî vê bi du salan bavê min û mêrên dî yê hozê gund spartin min û birayê min û çûn bi hawara Qraltiya Axê de da piştta wê bigrin di şerê wê û Neteweya Agir de. Hin kes bawer nakin ku wê Avatar ji nû ve peyda bibe û dinyayê xilas bike. Ew dibêjin, çerx carekê şkest, êdî ji kar ket. Lê min tu carî destê xwe jê neşûşt. Avatar wê her vegere û dinyayê xilas bike. (Wegera Avatar beşa yêkemîn; Katara 00:28 e.)*

Li jor ‘‘Onlara göre çember bozuldu bir kere’’ wergêr dikarî yekcar ‘‘Ew dibejin, çerx şkest’’ wisa wegerîne. Lê ji bo îhtîmalê ku mane tim neye fehm kirin ‘‘êdî ji kar ket.’’ lê zêde kirîye. Ango hinek ravekirîye.

### **Neologîzatîyon(neologization):**

*-Why don't you give us a hand, brainy?*

*-Çima tu destê alîkariyê nadî me, jîro? (Wergera Şînokê rêza 4)*

Li jorê ‘‘brainy’’ wek ‘‘jîro’’ hatiye wergerandin. Wexta em bala xwe bidin peyvek ji cihê ‘‘braîny’’ bigire di zimanê me de tune. Ango hem alîyê maneyê hem jî aliyê tesîrê. Herwiha em nikarin an jî naxwazin vî peyvî jê bibin. Wê gavê divê em peyvek nû çêkin. Divê ev peyv aheng, ton û hewayê dûblajê jî xera neke. Li jor wergêr peyva ‘‘jîro’’ ji xwe re çêkirîye.

### **Dewlemendkirin(enrichment):**

*Bana garip mi diyorsun? Sudaki aksini (yansıma) her görüşünde pazularını şişiren ben değilim ama hatırlatırım.*

*Ma tu dibêjî min sosret? Mêro ma ne tu hertim bazûyên xwe nîşan didî gava tu xwe di avê de dibînî. (Wergera Avatar Beşa yekemîn; Katara 02:37)*

Li jorê ‘‘Mêro’’ hatiye bikaranîn. Di metna jêder de peyvek wisa tine. Wergêr xwestîye naverok dewlemendtir bike. Teknîka dewlemendkirinê û teknîka ravekirinê dibe ku were tevlihev kirin. Di ravekirinê de mirov mecbûre peyv zêde dike ku mane xweşik were fehm kirin Lê teknîka dewlemendkirinê de metin tê fehm kirin. Em ji bo naverok hêj xweşiktir be peyv zêde dikin.

### **Dubarekirin (Repetition):**

*-Whoaaa!*

*-Whoaaa! (Wergera Şînokê rêza 81)*

Peyv heman şeklî hatiye dubarekirin.

**Notralizasyon (Neutralization):**


*-(angrily) your fortune said that if i laid down on a pile of driftwood, i would get a feather mattress!*

*-(bi hêrs) Fala te got heke ez li ser loda qirşan rûnim, ez ê doşekeke nerm bi dest bixim!*  
(Wergera Şînokê rêza 109)

Li jor “driftwood” wek “qirşan” hatiye wergerandin. Ji bo ku peyv were fehm kirin maneyekî gelemperî hatiye dayîn.

## 2.3. DÛBLAJA AVATARÊ Û DÛBLAJA ŞINOKÊ: METNÊ ORJÎNAL Û METNÊ KURDÎ

Peşî ku li ser wergerên Zarok TV-Avatar, Şinokê- li vê beşê de nîqaş bikin. Em dixwazin reya wergerê me kirî nîşê bidin. Gava yêkemîn divê em metna orijinal peyda bikin. Dûblajên van fîlmê kartonî wek jêr nivîs bi formatê “srt”hin malperên înternetê hene.(Subscene, DivX subtitles, Open subtitles...). Gava duyemîn peyda kirina programê jêrnivîs e.



Şikil 1.2. Wenyek ji programa Subtitle Workshop

Me wergera xwe bi programa “Subtitle Workshop” kir. Progamek belaş e. Ev program metinên formatê srt. vedike û em dikarin edî li ser metinê bileyzin. Yanê binivîsin, jê bibin, biguherînin. Gava seyemîn daxistina videoya fîlmê kartonîye. Em dikarin vî videoyê bi programa jêr nivîs ya me daxistî “Subtitle Workshop” ve vekin. Niha destê me de metna orjînal û videoya fîlmê kartonî hene. Di vê metinê de zimanê

Ingilîzî heye. Em jî bin hevoka Ingilîzî wergera xwe ya Kurdî dinivîsin. Lê wexta me werger kir divê em bala xwe hem metinê hem jî videoyê binerin ku li navbera metin û dîmênê hevsengîyek baş çêbibe. Li jor weneyek programê heye.

Me her dû metnên filmê kartonî-Avatar, Şînok- ji weşanên kanala Zarok TV stand. Wergera metna Şînok ji zimanê orjînal Ingilîzî hatiye çêkirin. Lê wergera metna Avatar ji Tirkî hatiye çêkirin. Me jî her dû metina ji zimanê orjînal werger kirin. Em ê van her dû wergera di vê beşê de binirxînin. Me jî temamê beşa yekemîn yê Avatar û beşek ji Şînokê werger kir. Lê em nikarin van metina li vê beşê dîyar bikin çimkî gelek dirêjin. Wergerên Avatar tinê 31 per e. Her dû metin jî di pêvekê de hene. Me li tabloya jêr şablona wergerên Avatar û Şînokê destnîşan kirîye.

Katara 00:00	
Zimanê Tirkî	Su, toprak, ateş, hava.. büyük annem geçmişİ avatarın su kabileleri toprak krallığı, ateş ulusu ve hava gezginleri arasında dengeyi sağlaması sayesinde dünyanın barış içinde yaşadığı döneme ait ilginç hikayeler anlatırdı.
Wergera Zarok TV(Ji Tirkî hatiye kirin)	Av û ax, agir û hewa....Dapîra min çîrokên ecêb digotin li ser demên berê. Wê digot, bi saya serê Avatar, Hozên Avê û Qraltiya Axê û Neteweya Agir û Gerokên Hewayî li hev hatine û aştî û xweşî li tevahiya dinyayê peyda bûye.
Ingilîzî(Zimanê Orjînal)	Water, Earth, Fire, Air. My grandmother used to tell me stories about the old days. A time of peace. When the Avatar kept balance between the Water Tribes, Earth Kingdom, Fire Nation, and Air Nomads.
Wergera me (Ji Ingilîzî hatiye kirin)	Av, ax, agir, hewa. Dapîra min ji me re çîroka gotîbûn li ser rojên kevin, rojên aştîyê. Heta Avatar hebû qabileyên avê, Qraltiya axê, Netewa agir û koçberên hewa li nav xweşiyê de bûn. Li temamê dinyayê adelet hebû.

Tablo 1.2.Wergerên Avatarê

Bapîr 00:00	
Ingîlîzî(Zimanê Orjînal)	Looks like we've landed in the ancient "land of the dragon!"
Wergera Zarok TV(Ji Ingilîzî hatiye kirin)	Wer dixuye em hatine Warê Ejderhayan ê Antîk.
Wergera me (Ji Ingilîzî me werger kir)	Wer xuya dike em hatine axa Ejderhayan.

Tablola.3. Wergerên Şînokê

Tiştê yekemîn ku em dixwzin li ser biaxivin, wergera ne ji zimanê orjînal e. Zimanê orjînal yê Avatar Ingilîzî ye lê ji zimanê Tirkî hatiye wergerandin. Ev şêvaz dibe sedemê hin alozî yan. Öpengin di gotara xwe de wergerên ne ji orjînal hatine kirin sê alîyan rexne dike û li gor wî divê “wergerên werger” neye kirin. Öpengin peşnîyar dike ku wek prensîp divê tim weşanxane wexta werger bikin divê ji zimanê orjînal bikin.

Rexneya yekemîn, hesasiyata wegera zimanê jêder(orjînal) wunda dibe. Duyemîn, wergerên ji zimanê orjînal tên kirin çêtir feyde dide ziman û tekîliyên Kurdî û zimanê din xurttir dibin. Wexta wergerên ne ji orjînal tên kirin deriyek ne baş ji bo pêşerojê vedike û dibe adetek. Seyemîn wexta ji zimanê orjînal werger neye kirin rêz girtina berhemên Kurdî kêmtir dibin. (Öpengin E. , 2011)

Bitaybetî wexta wergêrên zimanzan nayê peyda kirin werger ji Tirkî tên kirin. Herwiha wergera ji Tirkî alîyê aborîyê ve jî riyek erzan tir e. Wergerên wisa dibin hin sedemên xeletî yê. Wexta werger ne ji zimanê orjînal were kirin em nizanin ka metinên bo Tirkî çawa hatiye wergerandin. Dibe ku bo Tirkî xelet hatibe wergerandin an jî çawanîya(qalîte) we xirab bin. Ev sedem jî çawanîya wergera me bo kurdî lawaz dikan. Em ê li vir mînakêk bidin.

*Pekiala bu kadar oyun yeter. Gel katara yapacak işlerim var.*

*Baş e, evqas lîstik bes e. Were Katara, min karek heye bi te.*

*All right. No more playing. Come on, Katara, you have chores.*

*Baş e, evqas lîstik bes e. Ha dê, Katara, karên te hene.(Avatar; dapîr, 13:47)*

Di metina orjînal de ‘‘katara, you have chores’’ bo Tirkî xelet hatiye wergerandin. Divê ‘‘yapacak işlerin var’’ bû ya. Ji bo vê yekê wexta Kurdî jî hatiye wergerîn bi vê xeletîyê ve hatiye wergerîn.

Wexta em ji metina orjînal wergerînin gelemperî li ber me hevoksazîyek(sentaks) hêsan heye. Lê wexta em ji Tirkî wergerînin hevoksazîya metine gelek diguhere, bitaybetî eger biweş û gotinê peşîyan hebin. Herwiha ev tişt hevşengîyê jî xira dikin û karê hûnermendên dûblajê zehmettir dikin.

Di wergerê de yek ji herî muhîm tişt dîyarkirina sinifandina emrê ye. Ango dîyarkirina girseyê armançkirî ye(target audience, hedef kitle). Divê ev hêj serê ewil were tayîn kirin. Li gor malperekê înternetê ‘‘Commonsesemedia’’ divê zarokên 4+ çar salî zêde tir Şînokê temaşe bikin (the-smurfs, 2020). Ango wexta werger were kirin divê zarokên 4+ salî axaftinên Şînokê xweşik fehm bikin. Wexta wergêr peyv dihilbijirin an hevoka çêdikin divê ev her wext di hişê wan de bin. Herwiha li gor heman malpera înternetê divê 8+ salî zêdetir Avatarê temaşe bikin (avatar the last airbender, 2020). Bêguman xuya dike ku girseya armançkirî yê Avatar û şînokê ne yek in. Li gor emr hin cuda bûn hene.

Li gor me pirsgireka herî mezin di her du wergerên Zarok TV de daxwaza şewaza ehlîkirinê ye(domestication). Wergêr peyvên ji Farisî, Tirkî, Erebî ketine li nav Kurdî nahilbijerin û bikarnaynin. Wergêr dixwazin zimanê Kurdî ji ‘‘dagirkerîya zimanê din’’ xilas bikin û biparezin. Desavantajê herî mezin ya vê şewazê ne fehmkirina peyvvan û hevokan e. Çimkî wergêr çikas şewaza ehlîkirinê bikarbîne ewqas ji zimanê

rojane dûr dikeve. Zarok dibe ku van peyv an fêhm nekin. Em şewaza ehlîkirinê bitaybetî di karên ji bo zarokan de peşnîyar nakin. Çimkî peyv çikas aliyê etîmolojîk ve Farisî, Tirkî, Erebi be jî zimanê rojane cihê xwe girtine. Zarok bi van peyv an kurdî hîn dibin û nîzîkê ziman dibin. Herwiha ev peyv di hînbuna hevoksazîyê (sentaks) de tu astengî dernaxin. Bêguman wergêr şewaza ehlîkirinê heta dereceyek divê bikarbînin. Lê wexta di temamê peyv û hevoka de were bikarîn pirsgirek çêdibin. Wekî din bikaranîna biwêj û gotinê pêşyan dibe ku fehmkirinê de astengî derexin. Ji bo vî wexta biwêj, gotinê pêşyan were bikarîn divê yê sereke û hesan bin. Heke em rewşa Kurdî li Tirkîyê binêrin bikaranîna ehlîkirinê şewazêk gelek rîsk e. Çimkî zarokên kurd li her cihê bin tesîra Tirkî de ne. Eger zarok tiştê temaşe dikin fehm nekin we gavê dibe ku behna wan zû teng bibin û tercîha xwe li ser bernameyên Tirkî bikin. Em ê li tabloya jêr hin peyvên û biwêjên ji wergera Zarok Tv hatiye bikarîn destnîşan bikin. Li gor me ev peyv aliyê fehmkirina zaroka vê dibê ku zehmet bin. Em ê li şûna van peyv an hin peşnîyara bikin.

Peyv		Biwêj û Gotinê pêşyan	
Zarok TV	Em	Zarok TV	Em
Hozên Avê	Qabîleyên Avê	Destê xwe ne şuştin.	Hêvî kirin.
Şareza	Hosta	Çerx şikestin.	Nehatina dinyayê
Gewher	Element	Avê lê venaxwandin	Nikarî ji min birevî
Spartin	Emanet kirin	Silikandin	Tirsandin
Sosret	Ecêb	Tava nivê şevê lê dan	Aqil sekînin.
Mejînîsk	Bêmejî	Kar herimandain	Kar xirab kirin
Beretayan	Genî	Dû ketin.	Lê gerîn.
Sixûr	Casus	Zeft kirin	Girtin
Şazade	Prens	Ser nexistin	Ne karîn
Hilpekin	Bilind bûn	Tirsa xwe şikandin	Ji tirs xelas bûn.



Hût	Bîson		
Hijmekar	Ecebmayî buyîn		
Şênîyên gund	Gundî		
Qeliyane	Ne mane		
Biştexîlînin	Wextê beradayî borandin		
Sêwleko	Biçûko		
Arîşe	Mesele, Problem		
Şargeh	Cihê xefê		
Bîrhatî	Xatira		

Tablo 1.4. Li Avatarê Ehlîkirin

Peyv		Biwêj û Gotinê peşîyan	
Zarok TV	Em	Zarok TV	Em
Warê	Axê	Destê alîkarîyê dayîn.	Alîkarî kirin
Kampşînokek	Mal/Xanî	Sero, tu bi qurbana lingo!	Xwe xilas kirin.
Riz	Berinc		
Fal	Şans		
Nanpêj	Firin		
Newaze	Mikemmel/gelek hêja		
Pend	Nesîhet		
Şiverê	Riya kevir(stone path)		
Dagerîn	Zivirîn(turn)		
Zinarê mêzin	Kevirê mêzin(great rock)		
Aram	Bêdengî(quiet)		

Lod	Kom		
Kelevajî	Dînîtî		
Xindirîn	Li ser hatin( roll on)		

Tablola.5. Li Şînokê Ehlîkirin

Yek ji pirsgera wergerê ‘‘wergera raste rast’’ e. Yanê wergera peyv bi peyv e. Li vê şewazê de ‘‘mane’’ ne armanca yêkemîn e. Ji bo vê yekê pirsgerê fehmkirinê çêdibin. Bitaybetî di wergera bo zaroka de divê şewaza wergera ‘‘manê bi mane’’ were kirin. Li jêr me hin wegerên rastê rast destnîşan kirîye.

*Devasa ışık kütleleri. Uçan vizonlar. Hava bükücüler. Sanıyorum beni gece yarısı güneşi çarptı. Eve gidiyorum. Ormanda her şey daha anlamlı.*

*-Îca tîrêjên qerase. Gayên firinde. Hewa-baz û nizanim çi. Diyar e tava nivê şevê li min da. Vaye ez çûm. Li Daristanê hertişt beraqiltir e.(Sokka 08:47)*

*-The wisdom that you seek is close at hand...in my latest volume of quotations from brainy smurf!*

*Zîrekiya ku tu lê digerî ber destê te ye... di cilda dawî ya pirtûka min a jêgiranên şînokê jîr de ye!(Şînok, reza:47)*

*-Golly brainy's fortunes are really rock solid!*

*Errik! Falên Jîro bi rastî wekî kevîran saxlem in. (Şînok, reza:82)*

Peşîya wergerê hîlbijartina ‘‘peyvên sereke’’ gelek muhîm e. Çimkî peyvên sereke di metîna de gelek cara tê bikaranîn û çawanîya(qalîteya) wergerê bilindtir dîkin. Ji bo vê yekê wergerê hej dest pê werger nekirî divê herî kêmtam metîna carek bixwîne û peyvên sereke tayîn bike. Di metîna orjînal ya Şînokê de ‘‘fortune’’ 26 cara, ‘‘smurf’’ 21 cara, ‘‘cookie’’ 12 caran dubare kirîye.

Divê wergêr Kurdîya van peyvan baş hîlbijêre. Di wergera şînokê ya Zarok Tv de “fortune cookie” wek “kulîçeyê falan” û “smurf” wek “şînok” hatiye wergerandin. Li gor me wergera “fortune” bo kurdî “fal” di fehmkirinê de hinek zehmet e. Tişta yekemîn zarokek 4-5 salî dibe ku nizane “fal” çîye. Tişta duyemîn dibe ku peyva “fal” seh nekir bin. Tişta seyemîn tevlihevkirina bi peyvên “falan filan”, “falan pevan” e. Maneya “fortune” li gor ferhenga Wikîferhengê; çarenivîs, qeder, rojgar, şans, nesîb, qismet, siûd, talih, felek, enînivîs e. Di maneya “fortune” Ingilîzî ferhanga Google de; chance or luck as an external e. Peyva “chance” yanê “şans” li nav zimanê rojanê gelek zêde tê bikaranîn. Ji bo vê yekê me peyva “fortune” wek “şans” werger kir. Wekî din peyvên sereke “kulîçe” û “şînok” gelek serkeftî hatiye hîlbijartin. Herwiha di Avatar de peyva “bending” gelek cara dubare dike; Li vê dere wergêr “banding” wek “baz” wergerandîye. Wê gavê wergera “waterbending” “avbaz” dibe. Herwiha li gor vê peyvê “hewabaz”, “agirbaz”, “axbaz” çêkirîye. Wergêr li vir di hîlbijartina peyvekî serekede karekî gelek serkeftî kirîye.

## 2.2. DÎ AVATAR Û ŞÎNOKÊ DE ÇAWANÎYA HEVSENGÎYÊ

Di dûblajê de herî tiştê zehmet hevsengî ye. Divê film alîyê fonetîk, karakterîk û naverokî ve hev bigrin. Eger hevsengîyek baş tune be benha bînera zû teng dibin û ji filmê dûr dikevin. Hevsengîya filman û filmên kartonî ne wekhev in. Hevsengîya fonetîk û hevsengîya karakterî li filman gelek muhîm e. Tevgerên levê(devê) çawa ne? Peyv çawa hatiye derxistin? Peyv bi dengdêr an dengdar re dest pê dikin û dawî dibin? Tonê dengê yên hûnermendên dûblajê û yên listîkvanên filmê hev digrin an na? Kîjan devok(accent) were tercîh kirin? Divê di hevsengîya filman de bersiva van pirsan em bidin. Hevsengîya naverokî li gor hevsengîya karakterî û fonetîk ne ewqas muhîm e. Wexta dûblaj tê kirin di metinê de gelek guherîn çêdibin. Bîner şewaza dûblajê de nikarin metina orjînal bibînin ji bo vê yekê metna orjînal gelek rehet tê manîpule kirin û tê guherandin.

Filmê kartonî alîye hevsengîyê ve gelek cuda ye. Hevsengîya fonetîk û hevsengîya karakterî wek filmê nayê bikarnîn. Di filmê kartonî de listîkvan ne mirov in, karakterê karton in. Ji bo vê yekê tevgerên levê(devê), cureyên dest pê kirina herfên peşî, emr, kesayet di filmê kartonî de wek filma ne muhîm in. Di filmê kartonî de bêhtir jehatîbûna hûnermendên dûblajê pêş dikevin. Hûnermendên dûblajê çikas serkeftî bin filmên kartonî ewqas serkeftî dibin. Gelek cara di filmên kartonî de kesên mezin ji bo zarokan dûblaja dikin. Hûnermendên dûblajê dengê xwe dişibînin wek zarokan û gelek karê serkeftî dikin. Le em eynî tiştî filmê bikarbînin yê were ferq kirin. Herwiha di filmê karonî de girseya armançkirî(target audience, hedef kitle) zarok in. Li gor me hevsengîya filmê kartonî de yek jî herî tiştê muhîm hevsengîya naverokî ye. Hevsengîya naverokî, bala xwe dide hevsengîya metin û dîmên e. Yanê metin û dîmen hev digirin an na. Li vir dîmên, hejmara peyvê axaftinên karakterê kartonê, qalîteya wergerê gelek muhîm e. Wek mînak jêr di filma kartonî yê Avatar de Sokka li dîmena jêr 7 sanîya diaxivê û paşê dîmên diguhere. Li vir wexta werger tê kirin wergêr li gor hejmara peyva û dirêjîya dîmena hevokên xwe rast dikin. Eger hevok gelek dirêj bin an jî gelek kurt bin di hevsengîyê de pirsgirek çêdibin. Ev tişt karê hunermendên

dûblajê zehmettir dikan. Li jêr metina orjînal 18 peyv hene divê wexta werger were kirin alîyê peyvê ve kêr zêde nizîkê vê raqamê bibin.



Şikil 1.3. Woneyek Ji Avatar

It's not getting away from me this time. Watch and learn, Katara. This is how you catch a fish.

Vê carê ez avê lê venaxwim! Binêr û hîn be Katara. Masî wisa têne girtin!

(Sokka,01:51-01:58)

Di hevsengîya fîlmê kartonî yek ji pirs-girekê mezin wergera ne ji zimamê orjînal e. Wexta em ji zimanê orjînal werger dikan hejmera peyva metina orjînal dibînin kêr zêde li gor ve metina orjînal diçin li navbera wan hevsengîyek çedibin. Lê wek mînak ji zimanê Tirkî werger bikin dibe ku hevsengîyê pirs-girek derkevin.

Hevsîngîya fîlmê kartonî de girseya armançkirî(target audience, hedef kitle) zarok in. Me beşa yêkemîn rewşa Kurdî li Tirkîye nirxand. Kurdî bûye zimanê kêmanîyê li Tirkîye. Ji bo vê yekê wexta em ji bo bernemeyek kurdî metin nivîsin an jî ji bo fîlmê

kartonî werger bikin divê vî rewşa kurdî bîr nekin. Li gor me bitaybetî wergêr ne hewceye zêde xwe metina jêder( metina orjînal) girê bidin. Yanê divê wergêr azad tevbigerin. Li vir tiştê herî muhîm dîmen e. Piştî wergera me û dîmen hevbigrin pîrsgirek tunin. Lê vê dê qasta me maneye, naverok e. Wergêr dikarin ji mane û naveroka metin dûr bikevin. Divê armanca wergêr peşî fehmkirina zaroka bin. Çimkî gelek metinê filmê kartonî zimanê mezinan, peyvên argo, biwêj, gotinê pêşîyan, xenek hene û ji alîyê çandî ve gelek hevokên cuda dihewînin. Wergêr divê azad tevbigere. Divê bikaribin hin hevokan jê bibin, kurt bikin, ravê bikin, dubare bikin, dewlemend bikin. Wek minak li jê rê wergêra rastê rast hatiye kirin.

*Sen tanıdığım en ayrımcı, en sersem, en fındık beyinli. Akrabam olmandan utanyorum.*

*Min kesekî ji te gêjtir û mejînîsktir û jin-nexwaztir nedît. Ez şerm dikim ji ber ku tu birayê min î.*

*You are the most sexist, immature, nut brained... ..ugh, I'm embarrassed to be related to you!*

*Tu herî gejik, herî serhişk, herî bêmejî...Ah, Xwezî tu eleqeya min bi te re tune bûya.(Avatar;katara 03:27)*

Herwiha carina li metina orjînal di wextekî kin(hindik) de gelek hevok, peyv tê bikaranîn. Wê gavê wexta dûblaj were kirin divê ev metin zû were gotin ku hensengîyek çêbibe. Ev jî alîyê fehmkirinê pîrsgirek çêdike. Divê em van hevoka hinek kurt bikin. Lê eger peyv û hevokên me gelek kurt bin em dikarin hin peyv û hevokan baneşa(ûnlem) bikarbînin. Gelek filmê kartonî ev pîrsgirek heye. Hûnermendên dûblajê gelek zû diaxivin. Ev pîrsgirek ji wergera metine derdikevin.

## 2.4. BERAWİRDKİRÎNA DÛBLAJA ŞÎNOKÊ Û AVATARÊ

